



WEELAT



Çapemenî û medyaya İtalyayê jî cihêkî fireh da çalakîyên kurdan. Rojnameya Ultime Notizie ku li İtalyayê bi nav û deng e, paşgoyek bi zîmanê kurdî û tirkî derxist. Paşgo rojên 1718 sermawezê li ser hev du rojan derket. Di Paşgoyê de, wêneyên cur bi cur yên kurdan jî hatin çapkirin û li ser hatina Öcalan a Romayê sekîni. (Nûçe: R-7)

55.51 RADIO TAXI

ULTIMO NOTIZIE

OMAGGIO BÈBIA (PARASIE)

L.1000

Roma paytexta Kurda ye


Serokwezîrê D'Alerna: «Em destûre nadin ku Tirkîye santajê li me bike»

JÎ DOSTÊ ME KURDA RE!!!

Înê serê di rojnameya me de jî wêneyên ji bo Kurda li serêkê çarêkê Abdullah Öcalan derxistin û bi wê sermawezê Romayê jî wêneyên kurdî hatin çapkirin.

DERSEK JIBO EWROPA


Di derseke nû de jî wêneyên ji bo Kurda li serêkê çarêkê Abdullah Öcalan derxistin û bi wê sermawezê Romayê jî wêneyên kurdî hatin çapkirin.



Bi çûna Serokê Gişfî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ya Romayê re rayedarên dewleta tirk wekî ku kêşeya kurd çareser kiribin tevgeriyan, lê piştî demeke kurt ew hêviyên wan yek bi yek bi avê de çûn. Bi belavbûna nûçeyên li ser PKK'ê re bi hezaran kurd rabûn ser piyan û ber bi Romayê ve herikîn.

Vê tevgerê hêz da dostên gelê kurd, vê yekê jî bandor li polîtîkayên hikûmetê kir. Lewre jî bo dewleta tirk xeberên reş li pey hev hatin. Ev çend roj in kêşeya kurdî ketiye rojeva cîhanê, êdî pêwîstiya çareseriyê jî hêla her kesî ve tê zimên. (Nûçe: R. 8-9)

Azadiya WELAT



SAMI TAN

Her wekî birêz Haluk Gerger jî dibêje: "Gelê kurd bi berxwedana xwe serfiraz û azad dibe, lê civaka tirk di nava kirêtiya şer de mirovatiya xwe winda dike."

Divê gelê tirk ji destê faşizmê bê rizgarkirin

Gelê tirk bi qasî gelê alman nebe jî ji destê faşizmê gelek êş û azar kişandiye. Bi hezaran ciwanên tirk ên welatparêz bi destê çeteyên faşist hatine kuştin. Her wiha jî ciwanên tirk li dijî çeteyên faşist li ber xwe dane û nehiştine ku çeteyên faşist bigihêjin doza xwe. Lê îro ev çeteyên faşist li her derê êrîşî gelê kurd dikin û ji kesî dengekî dijber dernakeve. Berevajî vê yekê çapemeniya tirk êrîşên derdorên faşist wekî êrîşên gel pêşkêş dike. Dîmenên li Beyoğlu û Ümraniyeyê jî her kesî dit.

Êrîşên derdorên faşist jixweber dest pê nekirin, bi handana Serokwezîrê Tirkiyeyê Mesut Yılmaz û Serokomar Demirel dest pê kir. Li bajarên Tirkiyeyê bi êrîşên ji bo linçkirina kurdan û li Belçîkayê jî bi şewitandina saziyên kurdan encam da. Hinek aqilmendên dewleta tirk li ser helwesta erênî ya rayedarên Îtalyayê, dibêjin: "Dê Îtalya ji destê terorê êş û azarê bikişîne, lewre jî divê Öcalan radestî me bikin." Lê tişteki jî bîr dikin ku gelê kurd tu car wekî ku ew îdia dikin dest navêtiye şidetê, ji bo pa-

rastina hebûna xwe ji bêgavî dest avêtiye şerê çekdarî. Her wiha jî serokatiya tevgera kurd sê caran agirbest îlan kiriye, ji bo vekirina rîya çareseriyê ji destê wî çî hatiye kiriye. Lê mixabin hêzên ku ji şer rant bi dest dixin li ber çareseriyê bûne kelem û nehiştine ku tu gav bêne avêtin. Rast e, şidet li xwediyê xwe vedigere, lê gelê kurd ne dilxwazê şidetê ye û heke mafên xwe yên rewa bi dest bixe, dê yekser dev ji şidetê berde. Lewre bi qasî gelê kurd kesî ji destê şidetê nekişandiye. Lê vê yekê mirov dikare ji bo Tirkiyeyê bibêje, lewre xwediyên rejîmê li hemberî gelan her tim bi şidetê li ser piyan mane. Lewre jî rejîm ji şidetê hêz û quwetê distîne. Bi vê hêzê li ser piyan dimîne.

Serokwezîrê duh Demirel ku di dema kuştina ciwanên tirk û kurd de digot: "Kes nikare bi min bide gotin ciwanên neteweperwer mirovan dikujin." Îro jî bang li wan "ciwanên neteweperwer" dike, da ku li dijî gelê kurd êrîşan pêk bînin.

Tiştê ku mirov pê diêşe, îro gelê tirk

ji vê berxwedêriya xwe ya salên 1970'yî gelekî dûr e û ji bo van çeteyên faşist li çepikan dide, ev hovîtî li xweşiya hinekan diçe. Hinek jî bêdengiyê wekî aqilmendî dibînin. Lê ji îro ve çeteyên ku li Kurdistanê şer dimeşînin, ciyaka tirk dîl girtine û her roj li cihêkî bûyereke hovane pêk tê. Dema mirov lê dikole ku berpirsê bûyerê li Kurdistanê leşkerî kiriye. Dîsa îtîrafkarên ku bi destê rejîmê tene bikaranîn, di nava her karê kirêt de cih digirin. Ev rastî nişan dide ku gelê kurd îro di destê faşistan de dîl e.

Ev rewş gotinên Marks ên bi rengê "Gelê ku gelekî din diçewsiye, nikare azad bijî." diçespîne. Her wekî birêz Haluk Gerger jî dibêje: "Gelê kurd bi berxwedana xwe serfiraz û azad dibe, lê civaka tirk di nava kirêtiya şer de mirovatiya xwe winda dike." Divê her mirovê kurd derdor û cînarên xwe yên demokratî di wî warî de hişyar bike, bide zanîn ku rizgariya gelê kurd rizgariya gelê tirk e jî. Li ser vê esasê divê em banga hevalbendiya gelan bilind bikin.

Fêlbaziyên dewleta tirk xelas nabin...!

Ferhengok

- | | |
|--------------------------------|---------------------------------|
| bêje: peyv, kelime | nivan: mêvan |
| berfêso: şilope | pa: kesê di nivînê de |
| berxwedêr: direngen | pa: kesê di nivînê de |
| bêyom: bêoxir, neçê | panav: li cihê berz |
| bûçû: dûtûn alayî | panav: li cihê berz |
| bûka baranê: keskasor | payîn: libendeman |
| bûka berfê: kar- | payîn: libendeman |
| danadamî | payîn: libendeman |
| çespendin: îspatkirin | perav: qerax, keví |
| çarenûs: qeder | qerzdar: deyndar |
| dahûrîn: analîz | radestkirin: teslimkirin |
| darengî: malî | ragihandin: iletmek, |
| daxuyanî: aqklama | ragihandin: iletmek, |
| dirav: pere | ragihandin: iletmek, |
| êsta: niha, nika | amedîn: veketin |
| gewre: mezin | amedîn: veketin |
| handan: teşwîq | amedîn: veketin |
| heftok: beş taş oyunu | amedîn: veketin |
| hemîşe: her tim | amedîn: veketin |
| henderan: xeribî | amedîn: veketin |
| herî: çamûr | amedîn: veketin |
| hestiyarî: duygusallik | amedîn: veketin |
| hevbeş: hevpar, şîrk | amedîn: veketin |
| hilawestin: dardekirin, | amedîn: veketin |
| kêşe: arîşe, problem | amedîn: veketin |
| kirêt: qirêj, qilêr | amedîn: veketin |
| lêanîn: adaptasyon | amedîn: veketin |
| lêgirtin: nebexişandin | amedîn: veketin |
| lêvegerandin: bersiv- | amedîn: veketin |
| lêxêrveanîn: şukirkirin | amedîn: veketin |
| mamîk: tiştonek | amedîn: veketin |
| (bilmece) | amedîn: veketin |

Î. CAN DILBIRÎN

Ji agirbista PKK'ê ya roja 1'ê rezberê vir de êrîş, listik û komplo li dijî Serok û têkoşîna kurdan bêwestan û rawestan didomin. Dema ku mirov pisîkekê li quncikekî asê bike û bi daran li pisîkê bixe û bixwaze wê tune bike, ew dê bi lepên xwe biavêje ser û guhên mirov. Wan li me xistin, tecawizî xwişk û dayikên me kirin. Ma çî ma li me nekirin? Em dê êdî çiyê xwe winda bikin?

Ew dibêjin, dewleteke kurdan li Afrîkaya Başûr jî bê avakirin, em ê xera bikin. Erê, em fêm dikin ku daxwaza dewleta tirk çî ye. Dewleta tirk naxwaze di warê navneteweyî de kes çelî me bike. Yanî heya kengê wê bi qirkirin, kuştin û înkarkirinê bi ser gelê kurd de bêt?

Di nûçeyên televîzyonên xwe de bi pesindayîn wiha dibêjin: "Serokdewletê Bulgaristanê ji tirkên li welatê xwe, ji ber ku navên wan guhartine, lêborînê dixwaze." Baş e ew camêr in, ew mirov in. Lê hûn dê kengê lêborîna xwe ji gelê kurd bixwazin? Ev 600 sal in ku hûn ziman, çand, nav, hebûn û welatê wan înkâr dikin. Gelo çîma van şîretan li xwe nakin? Ji bo ku li ser kurdan axivîne an jî diaxivin geh êrîş

dibin ser Rûsyayê geh êrîş dibin ser Sûriyeyê. Yanî naxwazin ku navê kurdan li dinyayê bête bilêvkirin. Ji ber ku dema kurd bêne qebûlkirin, wê gera dinyayê li wan heram bibe.

Îcar jî gefan li Îtalyayê dixwin, da ku nehêle di qada dîplomasiyê de kurd li welatê wan bêne naskirin. Ne bi tenê gefxwarin, heta dibêjin em dê bikin ku leşkerên me li nava

dişewitînin. Îro bi hezaran kurd xwe gorî Serokê xwe dikin. Kî wê ji bo Atatürkê şovenîst agir berde canê xwe?

Kî wê ji bo Süleyman Demirel xwe bike qurban? Wan ji bo azadiya mirovahiyê çî kirine? Ji bilî şêxsen xwe çî ji kê re kirine? Lê, Serokê PKK'ê birêz Abdullah Öcalan ji bo mafê gelê kurd bi dest bixe, ev têkoşîna mirovahiyê da destpêkirin. Dewleta tirk û hevkarên wê yên rûreş, niha jî dixwazin hevaldoşkan ji xwe re çêbikin. Yek ji wan jî, dewleta alman e, em dibêjin bila ew neyên listikên tirkên şovenîst. Heta niha me dijmintiya tu welatî nekiriye, tenê em û rejîma Kemalîst dijminê hevdu ne, ew jî bêminetî ye. Dijminatîyeke wiha di dema faşizma Hitlerê de, li dijî cihuyan rû neda.

Em li benda çî sekinîne? Doh tevkuji û wêrankirin, îro di şexsiyeta Serokatiya me de, dixwazin navê me ji dinyayê rakin. Îro roj roja rizgarkirina namûsê ye.

Namûsa me kurdan îro welat û Serokatiya me ye, partiya me ye, şehîdên me ne. Rabin wekî ku filozan gotiye: "Hemû rê di Romayê re derbas dibin." Heydî ber bi Romayê ve ji Romayê jî ber bi Amedê ve... Ma îro na kengê?

Medyaya tirk bi pesindayîn dibêje: "Serokdewletê Bulgaristanê, ji tirkên li welatê xwe, ji ber ku navên wan guhartine, lêborînê dixwaze." Lê hûn ê kengê lêborîna xwe ji kurdan bixwazin?

Romayê bi cih bibin. Dîsa ji Sûriyeyê re jî digotin em dê dinyayê bi ser te de bihêrifênin. Lê bi baweriya min wan dinya bi ser xwe de hêrifandin.

Ji bo ku PKDW'ê li Îtalyayê komcivîna xwe pêk neyîne, tiştên nebûyî kirin. Lê di encamê de kî bi serket? Niha dibêjin bila Îtalya Serokê PKK birêz Öcalan teslîmî me bike. Kê di cihanê de dîtiye ku ji bo serokekî mirovan xwe şewitandiye. Ew, vê yekê hesab nakin. Ji bo Serokê xwe va ye bi dehan kurd canê xwe

Tava Romayê şewqa xwe da Welêt

Piştî ku çalakiyên gelê kurd dest pê kirin dewleta tirk jî digel çapemeniya şerxwaz dest bi banga seferberiya şerê navxweyî kir. Çapemeniya tirk jî êrîşên faşîstan li ber çavê gel mezin dike û gelê tirk bo şer teşwîq dike.

Piştî ku Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ji bo çareseriyê kûşeya kurd çû Romayê, gelê kurd jî ji bo ku girêdana bi serokê xwe ve nîşan bide li gelek welatên cihanê bi dest çalakiyan kir. Gelê kurd jî bo dayina statûya siyasî digel çalakiyên li cihanê li Kurdistan û Tirkîyeyê jî grevên birçîbûnê dane destpêkirin. Her wiha li gelek bajarên Tirkîye û Kurdistanê xwepêşandan pêk hatin û li gelek girtîgehên girtiyên PKK'yî jî bo dayina statûya siyasî ya bo Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan agir bi bedena xwe xistin. Serokê Giştî yê PKK'ê li ser çalakiyên xweşewitandinê daxuyaniyek da çapemeniyê û wiha got: "Em wekî partî jî vir û pê de çalakiyên xweşewitandinê qedexê dikin."

Piştî ku çalakiyên gelê kurd dest pê kirin dewleta tirk jî digel çapemeniya şerxwaz dest bi banga seferberiya şerê navxweyî kir. Di serî de Serokwezîr Mesut Yılmaz hemû nivîskar û siyasemedarên tirk di nivîs û daxuyaniyên xwe de bang li gelê dikin û wiha dibêjin: "Çi jî destê we bê, bikin. Li dijî Îtalyayê li 80 bajarî çalakiyên protestoyî li dar bixin." Çapemeniya tirk jî êrîşên faşîstan li ber çavê gel mezin dike û gelê tirk bo şer teşwîq dike. Çapemeniya tirk di her fersendê de HADEP'ê û gelê kurd wekî hedef nîşan dide. Di encama hedefnîşandayîna çapemeniya tirk de, faşîstên MHP'yî êrîşê birin ser gelek navçe û bajarên HADEP'ê ku dest bi greva birçîbûnê kiribûn.

Bûyerên ku li Kurdistan û Tirkîyeyê qewimîne

Mêrsîn: Polîsan êrîşê bire ser avahiya bajêr a HADEP'ê, navçeya Tarsus



û sê beldeyên ku girêdayî HADEP'a Mêrsînê ne. Di encama van êrîşan de 250 kesên ku di greva birçîbûnê de bûn, hatin binçavkirin. Li dijî vî yekê li taxên ku kurd lê dijî çalakiyên protestoyî pêk hatin. Di van çalakiyan de dirûsmeyên wiha hatin avêtin: "Bi can bi xwîn em bi te re ne ey serok", "Serok li Romayê, T.C di komayê de", "Bijî serok Apo", "Bijî PKK, ERNK, ARGK."

İzmir: Roja 15'ê sermawezê bi qasî 500 kesî li Kadifekale yê xwepêşandaneke li dar xist. Gel heta qereqola Kadifekale yê meşiya. Polîsan bi çekan bersiv da. Di encama êrîşê de 20 kes hatin binçavkirin. Piştî vî çalakiyê di 17 û 18'ê mehê de çalakiyan li taxên Yamanlar, Güzeltepe û Asarlık berdewam kirin. Her wiha grevên birçîbûnê li navçeyên Konak û Karşıyakayê didomin.

Amed: Roja 15'ê meha sermawezê jî aliyê ciwanan ve çalakiyê ke-

san hate lidarxistin. Piştî vî yekê li gelek taxên Amedê gelê jî bo ku girêdana xwe ya bo serokê xwe nîşan bide, çalakiyê xwepêşandan li dar xistin. Roja 17'ê mehê polîsan êrîşê bire ser HADEP'ê. Polîsên ku duyê şevê bi ser HADEP'ê de girt, hemû kesên di greva birçîbûnê de xist binçav. Di nav wan de gelek rêveberên navenda giştî û yên bajêr hene. Bi giştî 1000 kes hatine binçavkirin. Di bin çav de polîsan bi dîpçikan li serê ciwanekî xistiye. Di encama vî êrîşê hovanê de wî ciwanî jiyana xwe ji dest daye.

Wan: Roja 19'ê meha sermawezê bi qasî 400 polîsî tevî tîmên taybet û robokoban êrîşê bir ser HADEP'a Wanê. Nêzîkî 250 kesên di greva birçîbûnê de hatin binçavkirin. Di nav wan de jinên bi zarok û ducanî jî hene.

Edene: Li Edenê jî li taxên Onur û Ovaryê li Qada Salipazarê bi qasî 600 kes li hev kom bû û xwepêşandaneke li dar xist. Piştî demeke kin polîsan êrîşê bire ser taxa Uçaxê nêzîkî 10 kesî xistin binçav. Di vî navberê de çek jî hatin teqandin. Piştî van yekan jî aliyê sedan kesî ve li taxên cur bi cur çalakiyên girêdanê dom kir. Gelek taxên Edenê jî aliyê polîsan ve hatine dorpêçkirin.

Meletî: Li Meletî jî greva birçîbûnê dest pê kir. Ji aliyê din ve xwendekarên welatparêz ên Zanîngeha İnönü jî bo protestokirina şerê qirêj û girêdana bi Serokê PKK'ê re rojekê ketin çalakiya bojkotê.

Semsûr: Roja 18'ê sermawezê li avahiya bajêr a HADEP'ê greva birçîbûnê dest pê kir. Bi qas 30 kes beşdarî çalakiyê bûn.

Sêrt: Li HADEP'a Sêrtê jî roja 18'ê sermawezê greva birçîbûnê dest pê kir. Serokê HADEP'a Sêrtê Weysel Turhan daxuyaniyek da û di daxuyaniyê

de wiha got: "Çapemeniya tirk weşaneke nijadperestî dike. Çavê xwe li rastiya gelê kurd nagerînin. Bi van kirinên xwe yê nehiqûqî dixwazin gelê kurd û tirk berdine hev."

Stenbol: Li hemû navçeyên HADEP'ê grevên birçîbûnê dest pê kirin. Polîsan û faşîstên sivil êrîşê birin ser hemû navçeyên HADEP'ê yê Stenbolê. Di van êrîşan de li dora 1500 kesî hatin derdestkirin. Avahiyan navçeyên GOP, Ümraniye, Güngören, Bayrampaşa, Avcılar, Çekmece, Bağcılar, Kadıköy, Maltepe hatin tarûmarkirin. Digel vî yekê li gelek cihan çalakiyên ji bo piştevaniya Öcalan hatine lidarxistin. Hinek jî wan çalakiyan rastî êrîşê polîs û faşîstan hatin.


Mêrdîn: Li HADEP'a Mêrdînê jî bi beşdariyê mezî greva birçîbûnê dest pê kir. Li navçeya Qoserê çalakiya gel beramberî êrîşê polîsan ma, 37 hatin derdestkirin, 6 kes kes jî wan bo girtîgehê hatin şandin.

Elih: Li HADEP'a Êlihê jî dayikên girtiyên PKK'yî yê di greva birçîbûnê de beramberî êrîşê polîsan man. Di encama êrîşê polîs û tîmên taybet de 130 kes tevî rêveberên navenda giştî hatin binçav kirin. Li gorî ragehandinan polîsan dora HADEP'a Êlihê xistine bin çepêrê.

Qers: Li vî bajarî jî polîsan êrîşê çalakiya gel kir 8 kes hatin binçavkirin.

Li Tirkîye û Kurdistanê çalakiyên greva birçîbûnê piştî biryara dilên şer a bo vî çalakiyê dest pê kir. Her wekî li jor jî hate daxuyandin digel 10 hezar dilê şer bi hezaran mirovên Kurdistanî jî ji bo piştevaniya Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ketin greva birçîbûnê. Êrîşên hêzên dewletê û faşîsta jî nekarîna rê li ber van çalakiyan bigirin.

NAVENDA NÛÇEYAN



Li Navçeya HADEP'a Ümraniyeyê polîs û faşîstên MHP'yê digel hev êrîşê birin ser dayikên di greva birçîbûnê de.

M. Kemal bi van gotinan fermana Dêrsimê rakir:

Birîna me ya xedar Dêrsim e

M. Kemal piştî vê daxuyaniya fermî, qanûnekê pêşkêşî meclîsê dike. Ev qanûn bi piraniya dengên tê pejirandin. Li gorî vê zagonê Walîtiya Dêrsimê tê sazîkirin. Kesê ku wekî walî tê peywirdarkirin General Abdullah Alpdoğanê ku di nav gel de wekî xwînmij û çavsor tê binavkirin e.

Mustafa Kemal di sala 1936'an de di vebûna Parlementoya Tirk de li ser Dêrsimê axaftinekê dike. Axaftina wî di manşetên hemû rojnameyên tirk de tê weşandin. Axaftina navborî wiha ye:

"Gelşa me ya navxweyî ya herî mezin meseleya Dêrsimê ye. Ji bo ku ev birin û kula xedar ji holê bê rakirin, paqijkirin çî pêwîst be, divê bê kirin. Di vê babetê de bo ku biryarên bilezûbez bêne girtin divê hikûmet xwedî peywir û biryarên zelal û dorfireh be."

M. Kemal piştî vê daxuyaniya fermî, ji bo ku dijberiya mebusên kurd ji navê radîke, qanûnekê pêşkêşî meclîsê dike. Ev qanûn bi piraniya dengên tê pejirandin. Li gorî vê zagonê Walîtiya Dêrsimê tê sazîkirin. Kesê ku wekî walî tê peywirdarkirin General Abdullah Alpdoğanê ku di nav gel de wekî xwînmij û çavsor tê binavkirin e. Alpdoğan serdanpê bû xwediyê rayeya diktatoran. Her wiha ev kes di heman demê de wekî fermanîdar û berpirsê Mufetîsiya Giştî ya Sêyemîn tê wezîfedarkirin. Devera Mufetîsiya Giştî ya Sêyemîn Elezîz, Dêrsim û Çewlik e.

Ji bo pêkanîna projeyê pêşiyê li Elezîzê Walîtiya Dêrsimê tê sazîkirin. Alpdoğan li vê herêmê Rewşa Awarte îlan dike û gefan li gel dixwe. Navê Dêrsimê diguherîne û dike "Tunçeli". Dêrsimî bi van nîşaneyan fêmî dikin ku fermana wan hatiye rakirin.

Rewşa eşîrên Dêrsimê

Hemû eşîrên Dêrsimê ji rewşa tirsnaq haydar bûn. Li dû hev civîn li dar dixistin. Lê mixabin di nav serokeşîran de lihevhatineke başe baş tunebû. Nakokiyên berê li ber lihevhatina wan asteng bûn. Lewre jî bi tenê eşîrên dost di nav xwe de îtîfaqên herêmî saz dikin. Abasanê Jorîn, Ferhadan, Karabalyan, Bextiyar, Yûsûfan, Demenan, Heyderan û Kalan hevalbendîyeke xurt pêk anîn. Eşîrên li deverên Pûlûr, Qoçan, Şemkan, Mazgêrt, Pilemor û Nazmîyeyê bêalî dimînin û dikevin rewşa parastinê. Eşîrên Xozatê jî serdanpê xwe radestî hikûmetê dikin.

Hevdîtina Seyid Riza û Alpdoğan

Alpdoğan Seyid Riza tîne Elezîzê. Dr. Nûrî Dêrsimî di bîranîneke xwe de hev dîtina Seyid Riza û General Alpdoğan wiha tîne zimên: Piştî hev dîtîna min Seyid Riza dît. S. Riza ji min re wiha got: "Alpdoğan der barê Dêrsimîyan de ramanên pir xerab serê xwe de dihewîne. Lewre divê em li ber xwe bidin. Ji bilî vê tu rîya me tune. Artêşa Tirk nikare pêka



Dêrsimîyan bîne. Lê divê tu derkevî derveyî Tirkiyeyê û rewşa me ragihîni dewletên mezin."

Piştî kurtedemê Alpdoğan ji bo ku bi eşîrên Xozat û Pûlûrê re tîkiliyan dayne, Şevket dişîne herêmê. Şevket ji nakokiyên di navbera S. Riza û xwarziyê wî Rayber de agahdar e. Şevket bi Rayber re tîkiliyê datîne û bi dirav û listikan wî bi xwe ve girêdide. S. Riza ji tevaya rûdanan haydar e.

Şevket li nava eşîrên Xozatê digere û dek û dolaban digerîne. Di axaftinên xwe de dibêje: Dewlet ji bo qenciya Dêrsimîyan hewl dide. Em dixwazin S. Riza û alîgirên wî bêtesîr bihêlin. Her wiha piştî bîçekîrinê eşîrên din dê di cih de bêne serbestkirin.

Seyid Riza ji Alpdoğan dixwaze ku zagonên der barê Dêrsimê de bêne rakirin û rêveberîyeke ku mafên neteweyî û taybet di hundirîne bê damezrandin. Lê Alpdoğan bersiveke neyînî dide.

"Dêrsim xwîn digirî"

kurdan ên neteweyî bidin û kujerên kurê min radestî dadê bikin em dê amûrên leşkerî û leşkerên dil li we vegerînin. Lê Alpdoğan bêqeyd û şert dixwaze ku ew xwe radestî dewletê bikin. Li ser vê şer bêtir gur dibê.

Di vê navberê de brazîyê Seyid Riza, Rayber bêlayaniya xwe radigihîne lê bi awayekî sergirtî bi tirkên re tîkiliya xwe didomîne.

Tirk ji bo ku kurdan bixapînin, diyar dikin ku Rayber bi serhildêran re hevkarîyê dike. Rayber wekî sixûreki tirkan dikeve nava Eşîra Bextiyar û der barê hêzên kurdan de roj bi roj tirkên haydar dike. Rayber jî Seyid Riza efûyê dixwaze û diyar dike ku ji hemû listîkên tirkên haydar e. Lewre jî ji wan nefret dike û dixwaze li dijî wan şer bike. Seyid Riza jê bawer nake. Lê eşîrên din jê bawer dikin. Di gel hemû dijberiyên Seyid Riza ji bo ku li "Eniya Rojava" şer bike wî peywirdar dikin. Rayber xwedêgiravî li dijî tirkên dest bi şer dike.

Her çiqas Seyid Riza derkeve pêş jî, Alpdoğan dizane ku planên şer Elîşêr digerîne lewre jî dixwaze ku ew ji navê bê rakirin.

Navenda biryargeha Alîşêr şkefteke li Çiyayê Tûjîk bû. Rayber tim diçe û tê vê derê. Rojê Rayber bi heşt çekdarên xwe ve tê serdana Elîşêr. Elî Şêr radibe ji wan re xwarinê amade dike. Di wê keliyê de Rayber ji nişka ve Elîşêr gulbaran dike. Her wiha hevala wî Zarîfeyê jî di kuje. Rayber serê Elîşêr û jina wî jê dike, dixê tûrikeki û wekî xelat pêşkêşî Alpdoğan dike.

Leşkerên tirk hawirdora Çiyayê Tûjîk bi tevayî dagir kiribû û gelê kurd bi dilgirsî dikuşt. Devê şkeftên Çiyayê Tûjîk ku bi hezaran jin û zarok tê de bûn bi betonê tene honandin. Jin û zarok tê de difetisîn. Her wiha li ber devê şkeft û kadinan agir tê dadan û mirovên di hundirê wan de ji ber dûxana êgir bi jehrê dikevin an jî difetisîn. Piraniya jin û bûkên eşîrên Bextiyar û Qureşan ji bo parastina namûs û rûmeta xwe, xwe ji zere û asêgehên diavêjin xarê.

Leşkerên tirk li Herêma Uzun Meşe êrişî hêzên S. Riza dikin. Di vî şerî de jina wî Besê, kurê wî ye mezin Şêx Hesen, sê neviyên wî û bi hezaran leşkerên wî tene kuştin.

Piştî demêkê S. Riza li ser pira di navbera Dêrsim û Erzinganê tê girtin. Piştî darizandinê Seyid Riza bi 11 kesên re roja 18' sermawezê li Elezîzê li Qada Buğday bi berbangê re tê darvekirin.

AMADEKAR: MEMED SERHEDÎ

Êdî li her derê alozî û pozberîyan dest pê kiribû. Balafîran gelê bêtîfingx û destvala bombebaran dikir. Kurê S. Riza, Bira Îbrahîm bi hêzên Alpdoğan re dikeve tîkiliyê, li ser navê bavê xwe dixwaze tevgera leşkerî bi rengekî dadyane pêk bê. Şevket bi hevkarîya eşîra Qirxan wî dide kuştin. Li ser vê Seyid Riza gundê bi navê Sîn ku navenda Qirxaniyan dorpêç dike û kujerên wî dixwaze. Generalê tirk berevajî bicihanîna vê daxwazê xelatan dide kujerên.

Digel S. Riza eşîrên Bextiyarî Abasanê Jorîn, Karabalan, Ferhadan, Heyderan, Dedeman û Yûsûfan awayekî çalak beşdarî raperîne dibin.

Kurd dikevin rewşa êrişê û hêzên Îsmail Hakkî ber bi Devera Xozatê bi paş ve vedikişin. Li ser vê, artêşên Erzerom û Erzinganê bo şer tene amadekirin. Li cihên ku şer diqewîne bombeyên qazê yê jehrî û fetîsîner tene bikaranên.

Seyid Riza dîsa serî li Alpdoğan dide û dibêje: Ger hûn hurmetê nîşanî mafên

Rêzimanê kurmancî

SAMÎ BERBANG

Têgihên rêzimanî

Waneyên rêzimanê kurmancî bi deng dest pê kir, bi xalbendiyê dawî li mijarên ku dê li ser were rawestandin, hat. Di nava waneyan de gelek têgih derbas bûn. Ew têgih heta cihekî hatin ravekirin, lê ji bo gelek kesan ew têgih li gorî daxwazê zelal nebûn, ji ber vê yekê em dê hinekî li ser wan rawestin û beramberî wan di zimanê din de (ji ber ku piraniya kurdên Bakur bi tirkî dizanin) bi taybetî jî bi tirkî çî tê gotin wê bidin zanîn.

Rêziman: gramer

Deng: sewt (ses)

Pevdeng: diftong, birleşik ses

Mînak di kurdî de /xw/ di zimanê ewrûpî de ou, ei, ie û hwd.

Tîp: herf

Kurdên soran jê re dibêjin pît dibêjin, tirk "herf" a erebî bi kar tînin.

Dengdêr: ünlü, sesli (vowel)

Hinek di cihê vê têgihê de peyvên bideng, dengdar, danganî jî bi kar tînin.

Dengdar: ünsüz, sessiz (consonant)

Hinek di cihê wê de bêdeng, dengê lal, dengê sekinî jî dibêjin.

kîte: hece

Her koma dangan ku bi carekê re ji devê mirov derdikeve kîteyek e, dengdêr bi serê xwe dikare bibe kîteyek,

lê dengdar bi serê xwe kîteyekê pêk nayinin. Ji ber ku ew bi alîkariya dengdêran ji devê mirov derdikevin.

Peyv: bêje, gotin, şor, qise (sözcük)

Peyva xwerû: sade sözcük

Peyva hevedudanî: Birleşik sözcük

Peyva pêkhatî: peyva darijtî (türetilmiş sözcük)

Hevok: komek, cumle

Kirde: subje, özne, fail

Kesê ku kar dike

Bireser: obje, nesne,

Kes û tiştê ku di bin bandora wî karî de dimîne.

Zayend: cinsiyet

Nêr: feminin, eril

Mê: masculin, dişi

Nêtar: nötr

Mêjer: miktar

Ew têgih, pirjimarî û yekjimarîya peyvê nîşan dide.

Pirjimar: çoğul, plural

Yekjimar: tekil, singular

Hemwate: anlamdaş

Dijwate: zit anlamlı

Navdêr: ad

Tiştê ku nav didêre, di îngilizî de jê re "noun" tê gotin, tirk jê re "ad" dibêjin, hinek jî "isim" a erebî bi kar tînin.

Lêker: kar (fiil)

Di tirkî de peyva erebî "fiil" cihê vê peyvê digire, paşê jê re peyva "eylêm"

hatiye darijtin.

Lêkera xwerû: Sade fiil

Lêkera hevedudanî: birleşik fiil

Reşîdê Kurd di cihê hevedudanî de peyva "dumil" bi kar aniye.

Lêkera pêkhatî: türetilmiş fiil

Ji bo "türetmek" a tirkî darijtin jî tê bikaranîn.

Qertaf: ek

Di îngilizî de jê re affix tê gotin, di kurmancî de jî hinek jê re xurdebêj, kî û lêk dibêjin.

Pêşgir: prefiks (önek)

Di cihê wê de pêrkî, pêşdanî û xurdepêş jî tê gotin. Di zimanê tirkî de pêşgir nîn e, lê ji ber têkiliya tirkan a bi zimanên hînd-ewrûpî re ew peyva "önek" hatiye darijtin.

Paşgir: sonek

Di îngilizî de jê re suffix (safiks) tê gotin, her wiha di kurdî de peyvên wekî parkî, paşdanî û xurdepaş jî bo vê têgihê ten xebitandin.

Lêkera tebatî: pasif fiil

Lêkera lebatî: aktif fiil

Lêkera gerguhêz: geçişli fiil

Di nav kurdan de peyvên gerandî dervazî, têper û têgîha zimanên latînî transîf jî ten bikaranîn.

Lêkera negerguhêz: geçişsiz fiil

Avaniya lêkerê: fiil çatısı

tirkan ev peyv ji bîniya erebî

wergerandiye.

Tewandin: çemandin (bükmek)

Tewang: büküm

Di hevokên ku bi lêkerên gerguhêz saz dibin de ji bo ku kirde û bireser ji hev bên veqetandin, carinan kirde, carinan jî bireser hin qertafan digire an jî di hin guherîn di wan de pêk tên, ji vê yekê re tewang tê gotin.

Cînavk: cînav, bernav, pronav

Peyva ku cihê nav digire, tirk bo vê têgihê "zamîr" a erebî an jî "adıl" bi kar tînin.

Cînavkên xwerû: Sade zamir

Ev cînavk cihê navdêra xwerû digire û tu qertafan nagire û naguhere.

Cînavkên tewandî: bükülmüş zamir

Cînavkên kesane: kişi zamiri

Cînavkên şanîdanê: işaret zamiri

Cînavkên pirsîyarî: soru zamiri

Cînavkên nebinavkirî: belirtisiz

zamir

Cînavkên xweditiyê: iyelik zamiri

Cînavkên girêkî: bağlaç zamir

Cînavkên pêrebestî: bitişik zamir

Cînavkên berbihevin: yakınlaştırma

zamiri.

Cînavkên lihevîstî: Ev cure cînavk

bi tenê di kurdî de heye. Ev cînavk ji daçek û cînavkên wê pêk tê.

Rojeva giran

NEJDET BULDAN



Rojhilata Navîn germ bû. Kurdistan germ bû. Germahiya Kurdistanê tîna xwe da Ewrûpayê. Di serî da Yekîtiya Dewletên Serbixwe (Rûsya), paşê Îtalyayê. Yanî Ewrûpayê.

Belê me careke din dît ku Rûsya, ji dewra sosyalîzmê heya niha gelek zêde nehatiye guhartin. Mîna dema hilweşandina Komara Mehabadê, mîna dema dijîtiya Sovyetê ya li hemberî serhildanên Agirî, Dêrsim û Şoreşa Başûrê Mezin. Demên borî ku gotinên kemalîstan ên li ser reşkirina serhildanên kurd ji aliyê sosyalîstan ve dihatine pejirandin, îro jî, berjewendiyên din yê madî bandora xwe eşkera kir. Dîrok careke din dubare bû.

Helwesta rûsan ya li hemberî

kêşeya kurd nehate guhartin. Ne li ser navê sosyalîzmê, ne jî li ser navê Yekîtiya Dewletên Serbixwe.

Bawer dikim ku hatina birêz Öcalan ya bo Îtalyayê bi rewşeke dî ye. Amadekirineke bi zanîn e, pêngaveke dîrokî ye.

Niha Îtalya dê çî bike?

Bi baweriya min Îtalya li hemberî hemû êrîş û gefên dewleta dagirker dê raweste.

Yanî gotinên çapemenî û rayedarên tirk derew in. Hêştavnedîtine delîngên xwe hildane.

Senaryoyên ku li ser girtina Öcalan dihonin, wekî fiilmên tirkan in. Tirk bi wê xewnê jî şahî nabin.

Öcalan nadine tirkan. Bi ihtimaleke mezin heye ku penaberîya wî ya siyasî bête pejirandin û bi riyeke siyasî li Îtalyayê bimîne.

Wê demê jî pirsgirînga kurd dikeve qonaxêke nû. Jixwe hatina Öcalan ya bo Îtalyayê pêvajoyeke gelek nû ye û girîng e ji bo kurdan û her wiha jî ji bo Ewrûpayê.

Wê demê xebata siyasî dikeve pêşîya xebata leşkerî. Lê ev gotin nayê wê wateyê ku xebata leşkerî dê bête

sekinandin. Pêwîst e ku diplomaşiya kurdan jî xwe nû bike..

Di nava wan xebatan de wezîfeyên welatparêzî jî dikevin nava rêbazîyêke nû. Gelê kurd û dostên wî, pêwîst e ku çalakîyên xwe di bin çavan re derbas bikin.

Sazî û partiyên kurd dê xebatên xwe nû bikin. Bi piranî jî ji bo PKK'ê demeke nû dest pê dikete.

Partiyên din ên kurdan jî dê helwesta xwe di ber çavên xwe re derbas bikin.

Daxuyaniya Sekreterê Giştî yê PSK'ê birêz Kemal Burkay jî, vê yekê nîşan dide. Dîsa jî hêviya me ew e ku partiyên Kurdistanî, di vê pêvajoya nû de helwesta xwe careke din di ber çavên xwe re derbas bikin.

Bêguman di dîroka kurdan de rûpeleke nû vedibe. Ka emê binêrîn kurd û Kurdistanî dê dema nû çawa hildin dest? Dostaniya kurdan û têgîhîştina demokratîkî ya ewrûpayîyan çawan e?

Mercên Ewrûpayê ji bo mirovên mîna Öcalan giran in.

Dîsa jî tu bi xêr hatî birêz Öcalan.

Roja 23'an meha reşemiyê sala 1994'an bû. Şefeqê hîn nû lédabû. Apê Hemze bi qîra qîra dikan hêdika rabû ser xwe. Şalwarê xwe ji bin balgîvê derxist û bêyî ku çirê pêxe, destê xwe dirêjî gomlek û kirasên xwe yên ku li mixê bi dîwêr ve daleqandibûn, kir. Zarokên wî hîna di xewê de bûn. Jina wî Xaltîka Sara ji hişyar bû lê di nava nivînê de bû. Apê Hemze bi dengêkî nizm got jina xwe: "Tu ranabî! Sibe ye. Rabe sobeyê vêxe!" Apê Hemze rahiştî mênîne û deriyê odayê yê ku rizdeyên wî ji jengarê çizîni dikir, bi fesal vekir. Dema hate ber derî, bayekî sar û ceme-

dawêşandê. Qijîniyek jê çû. Zarok giryan û bi pêşa diya xwe ve zeliqîn. Di demeke kurt de reqereqa deriyan, kuxtekuxta kalan û pîran, hawar û qîrîna jinan û îskeîska zarokan û tevî qîreqîra tîm û leşkeran, hawirzeyek bi ser gundê Huseynîkê xistibû. Dema roj bi qandî çend werîsan bilind bûbû, tevahiya gundî jî li rasta pey mizgeftê civandibûn ser hev. Qomûtanê reşmitiran û mirûztîrş bi hêrs got: "Çabuk lan hizaya geçin. Hazirolda bekleyin!" Zarok û hema bibêjin tevahiya gundiyan bi cilên şevê derketibûn derve û niv-tazî bûn. Pîrikên gund bêkofî bûn

birjîn, destên we bişikên û...û...û." Ji nişka ve mêrê wê kete bîra wê. "Ew li ku ye? Gelo, wan ew bi xwe re bir?" Hîn ku xanî lê nehatî bû hev û tişt miştên tevîhev li erdê hiştin û bi lez xwe avête derve. Kî dît, jê pîrsa mêrê xwe dikir. Lê haya kesî pê neketibû. Serî li qereqol, qeymaqamî, emniyeta Licê da. Her wiha serî li DGM, walîti û emniyeta Amedê da. Lê bersiv her wekî hev bû: "Na! Kesekî wiha di dest me de tune ye." Dawiyê serî li Komela Mafê Mirovan xist. Li partiyên, kesên navdar, li parêzeran û ji rojnameyan re bû nûçe. Xelkê digot: "Gelo, mirov jî wî wîndî dibin? Pez wîndî di-

Goreyên wî yên şuştî û esirandî di nav kefa destê wî de mabûn. Li pey Weh-yedîn, careke din birayî wî Îhsan li A-medê tevî gelek kesên hatibû binçavkirin. Tam çil rojan lê geriyên. Cih nema serî lênedan. Îhsan jî wîndî bû. Piştî çil û sê rojan cendekê wî yê îşkencelêbûyî li Batmanê li kêleka riya trenê hatibû dîtin. Bihar çû, havîn hat û êdî payîz bû. Ev serê heft mehan bû ku Apê Hemze wîndî bû. Erd qelişiyê û ew tê de çûye. Peyva "wîndî" êdî li ser zîmanê her kesî bû. Berê sala şewatê hebû. Dema Serihildana Şêx Seîd Efendî ev gund hemû şewitandibûn. Navê wê salê bû-

Sala Windayan

di ruwê wî alast. Dinya bi mij û dûman bû. Apê Hemze hazirîya nimêja sibe dikir. Jina wî Xaltîka Sara jî rabûbû li seleba serşoyê destnimêj girtibû û sobe vexistibû. Çaydankê mişt av danibû ser sobeya veketî.

Piştî demekê xaltîka Sara kete taya Apê Hemze, ji ber ku wê carê dereng mabû. Di ber xwe de got: "Ev çi bû pê? Çima nehat?" Tu hesa mêrê wê nedihat. Her diçû dil lê diesirî û teng dibû. Ber bi şibakê ve çû, perde da alî, li derve nihêrî lê kesî xuya nedikir. Şirpîniyek jî nava dilê wê çû. Pêre canê wê giran bû, çokên wê lerizîn. Xeyalek dikir ku a niha wê mêrê wê jî derî ve têkeve hundir ku ji milên wî yên şemirandî ava destnimêje diçilke û ji sermana dizûzîke. Lê belê, xeyala wê belewele dibû û bi dîwêrên odê ve wîndî dibûn. Hema ku diwarên odê lê dihatin hev. Nefes lê çikiya. Bi lezgîni xwe avête derve.

Di gel ku bayekî cemidî li rûyê wê xist jî, caraka din çet his nekir. Li derve dinê baş ronî bûbû. Çavên xwe li ser gund gerandin. Tu tiştekî ne asayî tune bû. Dema berê xwe ber bi wê berpala li alî gundê Cinezûrê ve zivirand, bi terperepek tevîhev re serê çend tîman xuya kir. Di cihê xwe de cemidî. Tîm bi dengêkî zîz û bilind qîriyan "Kıyrdama! (xwe tevnedê!)" Xaltîka Sara xwe tevnedê. Di wê demê de ji her alî ve leşker û tîman êrişî ser gund kir.

Qeflek leşker û tîm bi hev re ket hundirê mala Apê Hemze. Bi potên xwe ên biherî li ser nivînan geriyên. Zarok ji nav cihan hilpiçiko bûn. Bêyî ku zanibin ka çi diqewime xwe bi quncikê diweran ve zeliqandin. Tîm û leşkeran pel û pot belewele kirin. Ji kilerê çî zexire hebû kirîşandin eywanê û tevîhev kirin û wan digot: "Lan bu kadar yiyeceği ne pıyorsunuz? Terorist besliyorsunuz, dimi?"


Tîmekî pehîna xwe li kûza avê xist. Kûz gilolo bû. Xaltîka Sara bêhemdî dikir were wan: "Hûn çi dikin? We mala me mîrat kir." Tîmekî pehînek

Aylar önce gözaltına alınan 60 yaşındaki Hamza Haran ile koylusu İhsan Haran'ın yakınlarının bütün çabalarına rağmen haber alınamadı

Diyarbakır'ın Otis semtindeki işyerinden 24 Aralık günü saat 15 polistörce gözaltına alınan İhsan Haran ile 23 Şubat günü Lice'de Huseynîk (Arskî) köyünden askerler tarafından gözaltına alınan Hamza Haran'ın haber alınmıyor. Hamza Haran'ın yakınları tüm başvurulara rağmen, bir sonuç alamadıklarını belirttiler.

Ofis semtindeki işyerinin önünden polisler tarafından gözaltına alınan İhsan Haran'ın (25) eşi Nesibe Haran (24), eşi gözaltından kaybolmalarından dolayı gözaltında bulunduğu söyleniyor. Kayınbiraderleri Abdullah Haran'ın 1 Şubat günü, Seyidhan Haran'ın ise 7 Şubat günü gözaltına alındığını belirten Nesibe Haran, "Onlar daha sonra çıkarıldıkları Diyarbakır DGM tarafından tutuklanarak cezaevine konuldular. Ancak eşi İhsan'ın haber çıkmadı" dedi.

Eşinin akıbetini öğrenmek için 8 ve 10 Şubat'ta Diyarbakır DGM Başsavcılığına başvurduğunu belirten Nesibe Haran, "Bünyeli bir sonuç alamadığını kaydetti. Gözaltına alınan eşinin, Diyarbakır Çevik Kuvveti'ne gözaltına alınan bir kişi tarafından da götürüldüğünü belirten Nesibe Haran, İHD, Uluslararası Af Örgütü, Smu (Tutuklu Avukatlar Birliği) ne başvurduğunu söyledi. Haran, "Eşimin polisler tarafından alındığını, kayınbiraderim gözleriyle gördü, ancak 3 aydan beri haber alamıyorum" dedi.



Hamza Haran

İhsan Haran

Koylusu de kayıp

İhsan Haran'ın koylusu olan Hamza Haran (60) da 23 Şubat günü Lice jandarması Komutanlığı'na bağlı askerlerce gözaltına alındıktan sonra bu daha kendisinden haber alınmadı. Lice'dim Huseynîk (Arskî) köyünde oturan Hamza Haran'ın, köye operasyona gelen askerler tarafından alındığını belirten yaşlı eşi Sara Haran, köylerinin daha önce de sık sık korucu olmasına zorlandığını belirttiği çânları söyledi.

"En son köyümüze 23 Şubat günü gelen askerler köydeki bütün evleri aradılar, sonra eşi Hamza'yı yanlarında alarak götürdüler." Gözaltına alındıktan sonra çânlardan bir daha haber alamadığını belirten Sara Haran, Lice Cumhuriyet Savcılığı'na başvurduklarını, savcılıktan böyle bir tîm gözaltında olmadığını yönünde cevap aldıklarını söyledi. Sara Haran, Diyarbakır DGM Başsavcılığı'na ve OHAL Vahîği'ne yaptığı başvurularından da sonuç alamadığını sözlerine ekledi.

Hamza Haran û İhsan Haran di sala 1994'an de ji aliye polîsên tirk ve hatin revandin. Lê peyre termê wan hate dîtin. İhsan Haran li cem xenzûrê xwe hatiye derdestkirin. Ev nivîs li ser rastiya serpehatiya Hamza Haran hatiye honandin.

û porên wan ên xeydbelek gijomijo mabû. Kalîk jî bêkum û şaşik ji sermana dizûzîkiyan û liçik ji pozên wan diherikî bi ser lîvên wan de. Pilj û hêstir di hinarokên wan de pelas dibûn. Tîm û leşkeran mêrên gund yek bi yek dan ber pîrsan: "Adın ne lan...Kaç çocuğun var...Neredeler? Pis Ermenî. Yalan atıyorsun. Şimdi karını soyar gözlerinin önünde bu askerlere s....."

Pehîn, kulm û kulpîna dengê qundaxê tivingan ku li sing û li serî û li nav piştan diket û tevî qarewara jin û zarokan dibû. Zarokên berşîr serê xwe hişk di nav pêşîrên dayikên xwe ve zeliqandî bûn. Ev cara çendan bû ku ev tiştên hanê dihat serê wan.

Berêvarkî tîm û leşker ji nava gund vekîşiyên. Xaltîka Sara nivînen belewele û pel û pot berhev kirin. Çend êzing bera sobê dan. Zarokan xwe da ber sobê. Bi pitepit nifir ji devê Xaltîka Sara dibariyan: "Agir bi mala we bikeve. Hûn xêrê ji xwe nebînin. Çavên we

bîn. Dewar wîndî dibin û hesp û... Lê însan çawa wîndî dibin? Însanê biaqil. Ma çawa însan riya mala xwe nizanin û wîndî dibin?"

Apê Hemze, apê gerîlayan bû. Biraziyên wî Serdar û Remzî êdî her yek bi xwe efsaneyek bû. Her ku behsa wan dibû, pesivandineke veşarî dilê apê Hemze radimûsand. Digel ku di şêst saliya xwe de bû jî, van salên dawîn bi ser xwe ve hatibû. Dilê wî wekî dilê xortekî çardeh salî lê dida.

Meha adarê bû. Ev serê mehekê bû ku Apê Hemze wîndî bû. Biraziyê wî Wehedyînê birayê Serdar û Remzî dasa xwe girtibû çûbû nav rezan. Wê rojê dîsa li wan hawirdoran operasyonêkê dest pê kiribû. Şeş derb gule ji par ve û ji nêz ve berdabûn nav piştê Wehedyîn, ji wan qotikên çixarên Malboro, Camel û Tekel 2000'an ku li dora cendekê wî bûn, diyar bû ku gelek pê re axivîbûn.

bû "Sala Şewatê". Navê wê salê jî êdî ji nîna ve bûbû "Sala Windayan". Li kolan û sikakên bajarên tîlikên bêbext li ser tetikan bûn.

Filankeso hatiye windakirin...Bivankeso hatiye kuştin...

Payîz bû, dema çûyîna ser rezan nêzik bûbû. Jineke gundiye Apê Hemze, dema çend berxikên wê ji çolê nehatibûn malê. ew ji li wan newalên di navbera gundê wan û Cinezûrê diket, li berxikên xwe digeriya. Hîn ku berxik nedibûn, di bin kemeke şafir de hestiyekî qalind bi ber çavên wê ket. "Ev çi hestî ye?" Baş dêhna xwe dayê: "Erê, erê. Wîîî, bi Xwedê ev hestiyê han yê çaqê însanan e." Dema xweste destê xwe dirêjî hestî bike, Apê Hemze bi riha xwe ya spî û bi rûyê xwe yê bi çiqir wekî pê re bibişire hate ber çavên wê. Jînikê kir ku deng lê bike lê gotin di qirika wê de asê man. Ji nişka ve tirseke ecêb li jînikê peyda bû. Canê wê lê giran bû. Xwest ku biqîre, hawar li dar bike. Dewxa wê çû. Serê wê werimî, bû wekî defê. Bi bazdan berê xwe da nava gund.


Barana ku wan çendên berê bariyabû, lehiyê axa ji ser herikandî bû û hestî derketibû derve. Goştê wî riziyabû lê cilên wî hîn xweş dihatin naskirin. Heta qutiya wî ya çixarê di bêrika êlêgê wî de bû. Kumê wî yê bi xêzên çeprast nexşirî di bin qaçotika serê wî de ma bû. Axeke puxirîn û nerm li ser bû. Gundiyan ax bi destdan ji ser da alî, hestî yeko yeko berhev kirin, bataniyek li erdê raxist. Cawekî spî avêt ser û caw li hestiyên lefand. Şimûdikeke spî ku wan ji caw jêkiribû pê serê caw, nav û binê caw bi gireyên hokî girêda. Li nav goristana ber zîyarête gorek kola, kevirên hûrik û rengo mengo li ser gorê rêz kirin. Wan piştê gorê avreşan kir. Meleyê gund piştî xwendina telqînê axîneke kûr kişand û bi dengêkî lertzok û zîz got: "Xwedê heqê wî nehêle!" Kes nedigiriya. Heta ji ber ku piştî heft mehan hestiyên windayekî hatibûn dîtin nivkêfxweşiyek jî hebû.

□ 27 sermawez 1984:

PKK hate damezirandin

Partiya Karkerên Kurdistanê di 27'ê sermaweza 1978'an de hate damezirandin. Berî vê damezirandinê kadroyên PKK'ê yên pêşîn bi navê Apociyan di sala 1976'an de dest bi xebatên siyasî kiribû. Kongreya PKK'ê ya yekemîn di 26-27'ê sermawezê 1978'an de li Fîsa Licê ku girêdayî Amedê ye pêk hat. Kongre ji her navçeyekê bi temamî bi beşdarbûna 25 kesan hate lidarxistin.

BÛYERINE JI DÎROKÊ



□ Sermawez 1983:

Hunerkom hate damezirandin

Hunerkom bi armanca ku çanda kurdan ji piştaftin û windabûnê xelas bike, bi rêberiya şehîd Sefkan û Mizgîn li Kolna Almaniyayê hate damezirandin. Li Hunerkomê wekî komeleyekê xebat pêk dihatin. Ji bo warê xebatên li ser çand û hunerê berfirehtir bibin, di sala 1993'yan de jî Akademiya Kurdî hate damezirandin.

Ji Îtalya jesteke cihê reng

Piştî hatina Serokê Giştî yê Partiya Karkerên Kurdistan (PKK) Abdulallah Öcalan li Îtalyayê, bi deh hazara kurdên li ewrupa dijîn çûn vî welatî. Kurdên ku çûn vî welatî derya spi mitîng, meş û gelek çalakîyên din li dar xistin û piştigiriya xwe ji bo serokê xwe yê neteweyî nîşan dan.

Çapemenî û medyaya Îtalyayê cihêkî fireh dan van çalakîyan. Lê belê pirs-girêkek hebû. Kurdên ku di navbera hefteyekê de çûn Îtalyayê, zimanê vî welatî nizanibûn û ji van rojnameyan tiştêk fêm nedikirin. Rayedarên rojnameya Ultime Notizie ku li Îtalyayê bi nav û deng e, bi rojan fikirîn û dawiyê çareseriyek dîtin û gotin ji bo kurdên ku niha hatine Romayê em, paşgoyekê ku du rûpel bi kurdî, rûpelek jî, bi zimanê tirkî be derxin.

Rayaderên rojnameyê hema dest bi kar kirin û di navbera sê rojan de paşgoya xwe amede kirin û du rojan li ser hev, weşana xwe bi zimanê gelê kurd, kurdî kirin.

Di paşgoyê de çi hebû?

Paşgo rojên 17 û 18'ê sermawezê du rojan li ser hev derket. Di weşana xwe de bi giranî li ser armanca kurdên ku hatine Îtalyayê sekinî û cih da hevpeyvînan. Paşgoye, wêneyên cur be cur yên kurdan jî çap kir û li ser hatina Öcalan a Romayê sekinî. (A. WELAT/ROMA)



Ji bo avakirina arşîva neteweyî gava yekem



Ev demeke dirêj bû ku Înstîtuya Kurdî li Stockholmê amadekariya avakirina arşîveke neteweyî dikir. Piştî kongreya salê ku di meha derbasbûyî de hate kirin, komîteya karger di civîna xwe ya yekemîn de biryar da ku vê xebatê xurtir bike û gavên pêwîst bînin avêtin. Ji bo xurtkirina arşîvê û xizmetdayîna lêkolîneran û ji bo berhevkirina pirtûk, kovar, dokûment û filmên li ser dîrok, çand, ziman, adet û toreyên kurdan, rojnamevan-nivîskar Gabar Çiyan û lêkolîner Şoreş Reşî wekî berpirsiyarên giştî hatin hibijartin.

Çiyan û Reşî derheqê vê xebatê de wisa got: "Arşîv dê pir fireh be. Navenda wê li Înstîtuya Kurdî li Stockholmê ye. Hedefa me ew e ku em pirtûk, dokûment, kovar û fimên li ser kurd û Kurdistanê ne berhev bikin û bixine xizmeta lê-

kolîneran. Bi salan e ku cihêkî wisa pêwîst bû û ji ber nebûna dezgeheke wisa, xebatên rewşenbîrî baş birêve nedicûn. Em ji bo dagirtina vê valahiyê derketin rê û me gava yekemîn avêt. Her welatek, arşîvekî wî yê neteweyî heye. Dagirkeran, di qonaxên dîrokî de ji bo ku kurdan ji rehên wan dûr bixin û ji çand û dîroka wan re bikin biyan, gelek cihên arkeolojîk xirab kirin, dokûment û pirtûkên heyî talan kirin, şewitandin. Talana duh, îro jî li Kurdistanê didome. Lewma ye ku li welêt vê keliyê mecalên avakirina dezgeheke wisa hîna çênebûye.

Armanca me ev e ku ev dezgeh, bi şerê çekdarî re gav bi gav navenda xwe bibe Kurdistanê û li welêt bi cih bibe. Hebûna vê dezgehê li derveyî welêt, demdemî ye. Hêviya me jî gelê kurd û dostan, kes û dezgehên ev e ku alîkariya me bikin. Li ser belge, pirtûk, dokûment û fimên li cem xwe, me agahdar bikin û bi me re têkevin têkiliyê."

Ji bo kesên ku dixazwin bi Înstîtuya Kurdî ya Stockholmê re têkevin têkiliyê:

Navnîşan: Kurdiska Institutet, Fridhemsg. 15,3 tr. 112 40 Stockholm-Sweden.
Tel-Fax: 46 8 652 34 29
A. WELAT /STOCKHOLM

ÇAVDÊRÎ

Çima tu nanivîsî?



JAN DOST

Gelek dost û dilxwaz rastî min tînin, dipirsin: Kanî ew helbestên ku te dinivîsandin? Dema ez ji wan re rewşa xwe û nivîsandinê şîrove dikim, lêvên xwe diqermicînin û belkî di dilê xwe de dibêjin: "Ev camêr ji dest me çû...!!" Na birano ne wekî hûn dibêjin ez hîn nivîskar im, lê şeweya nivîsandinê min hatiye guhartin. Ez ji germiya helbestan dageriyame giraniya lêkolînan. Yên helbestan dinivîsin gelek û li gorî meteloka kurdî "Solên min di şibakê re avêtine" ango ji min xweştir dinivîsin.

Ne ji mercên nivîsandin û helbestvaniyê ye ku her teqînek an bûyerek biqewime, ez bi stûyê pênuşa xwe bigirim û wê bi zorê bicircirînim ser rûpelan. Helbestvanî kaniyek e, ji xweber diteqe, ne bi fermana filan û bêvan. Helbesta ku bi xwe nebe mêvan li dilê min, helbesteke bêcir û bêtesîr e. Helbesteke seqet e, lal e, ez dikarim navê şehîdekê bînim zimên di helbestê de, lê gelo wê layiqî wê şehîdê be, eger ev helbest qels û bêkêr û bêtîn û bêrewa û bêhest be? Bêyî şoreşeke di zimên de, di girêdan û têkiliyên navber, peyv û hevokan de wê çi helbesteke xweş were nivîsandin.

Nenivîsandina helbestê nayê wê wateyê ku ez êdî ne helbestvan im, an dilê min ji şehîdan re naxwaze, yan ez mijûlî jiyana xwe ya taybet im. Hezar helbest li ber sola şehîdekî diçin sicûdê. Dilopek xwîn ji dilê kurdekî biniquete, hêjayî sed helbestvanî ye.

Ez bûyerên diqewimin li welatê me dibînim û dibihîzim, ez pê diêşim û dilê min tê guvaştin. Ez ne li ezmanan dijîm. Ez di nav gelê xwe de û li ser axa xwe dijîm. Min bernamêyek ji nivîsên xwe re jî daniye û ez gav bi gav pê ve diçim. Pirtûkên binirx di tarîxa me de werdigerînim. Di meydana wergerandin û lêkolînan de çal dibim û helbest jî di dilê min de dikelin. Di şevên tenêtiyê de jî dinivîsim û di pêşerojê de wê xuya be ka ez çi dikim û çi dinivîsim. Tenê hêvî dikim ku ev yek were naskirin. Nivîsandin bi qurban û heyran nameşe. Nivîsandin bihar e, berî zivistanê nayê.

Ne jî mafê tu kesî ye bibêje filan helbestê yan jî filan mijarê binivîse; azadî û serbestiya nivîskar di ser her tiştî re ye.

Kêşeya kurd ke

Dînya kurdan

Her wekî di serî de jî Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan dabû zanîn, gava ku wî avêt, di warê navteweyîbûna kêşeya kurd de qonaxeke nû da destpêkirin. Ji roja ku Öcalan jî balafirê peya bûye heta îro, kêşeya kurd di rojeva hemû cîhanê de ye. Kesên li nik jî, yên li dijî xwe mecbûrî nîqaşkirinê dibînin. Li seranserî cîhanê kurd li ser piyan in û ev yek bala cîhanê dikişîne ser kêşeya kurd.

Rojev bi nûçeyekê serobino bû. Roja 13'ê sermawezê hemû televîzyonên tirkan bi nivîsên "flas ...flas" nûçeyek weşandin: "Serokê PKK'ê li Romayê hate girtin." Serokwezîrê Tirkiyeyê, ku ji ber eşkerebûna têkiliyê xwe yên bi Korkmaz Yiğit re tengav bûbû, saet di 16.00'an de digel cigirê xwe Bülent Ecevit civîneke çapemeniyê li dar xist. Yılmaz, da zanîn ku wan şerê li hemberî PKK bi serkeftinê biriye serî. Her wiha jî wî bersiv neda pirsên li ser aqûbeta hikûmetê, bi tenê Ecevit da zanîn ku ew dê ji hikûmetê venekîşin. Di nava vê derûniyê de çend roj derbas bûn, daxuyaniya şewirkarê wezîrê edaletê yê Îtalyayê hat. Wî, diyar kir ku ne gengaz e ku Öcalan radestî, welatekî ku lê ceza yê îdamê heye, bikin. Piştî vê daxuyaniyê jî bo dewleta tirk xeberên reş li pey hev hatin. Li ser van xeberên reş, du wezîrên dewleta tirk İsmail Cem û İsmet Sezgin çûn Romayê. Lê bi vê yekê jî dawî li xeberên reş nehat. Lewre Serokwezîrê Îtalyayê Massimo D'Alema da xuyakirin ku ew dê ji gef û gurên tu dewletê re serî daneynin. Her wiha Serokomarê Îtalyayê Luigi Scalfaroy jî da zanîn ku hatina Öcalan bo mafên gelan derfeteke mezin e.

Li aliyê din piştê derket holê ku Öcalan ne di girtîgehê de ye, lê belê di nexweşxaneyê de ye. Bi van daxuyaniya re çapemeniya tirk û rayedarên dewleta tirk dest bi çerfiroşiyê kir. Piştê jî li hemberî sazîyên kurdan ên li Tirkiye û Ewrûpayê êrişên faşîstan û hêzên dewleta tirk gur bûn. Ev rewş rastiya civaka tirk li ber çavan radixe. Rejîm jî bo ku li ser piyan bimîne, dixwaze di navbera gelan de şer bide destpêkirin. Ev yek jî hêza Tevera Azadiyê û asta tengavbûna rejîmê nîşan dide.


Ji aliyê tirkan ve dîmena bûyera çûna Abdullah Öcalan a bo Romayê bi vî rengî ye, li aliyê kurdan rewş çî ye? Bi derketina vê nûçeya flas, wekî televîzyonên

tirkan de MED-TV jî weşana berna-meyên heyî birî û ragihand ku nûçeyekê bi rengî heye, ji ber nazîkbûna rewşê, ew li ser mijarê lêkolînê çêdikin, ew dê di zûtirîn katê de raya giştî li ser rastiya bûyerê agahdar bikin. Piştî demeke kurt jî daxuyaniya Öcalan hate weşandin. Öcalan dida zanîn ku berî ku ew were Îtalyayê, wî rayedarên dewletê agahdar kirine û bi hatina xwe re serî bo bidestxistina statûyê siyasî li cihên pêwîst daye û ji bo bersiveke erênî yan jî neyînî hîn zû ye.

Her wiha Öcalan xwest ku hemû gelê kurd û dostên gelê kurd hişyar bin û rûdanan bi baldarî bişopînin. Di nûçeyên MED-TV'yê de hate diyarkirin ku dê rayedarên PKK'ê di demeke kin de, li ser bûyerê agahiyên berfirehtir bidin raya giştî. Bi belavbûna vê nûçeyê re, kurdên Ewrûpayê ku ev demeke jî bo protestokirina komploya li hemberî Öcalan di nava çalakiyan de bûn, seferberî dane destpêkirin û bi hezaran kurd ber bi Îtalyayê ve herikin. Li nik vê yekê li seranserî cîhanê kurdan dest bi çalakiyan kir. Di nava çalakiyan de xwepêşandan, grevên birçibûnê û xwe şewitandin jî hene. Tevî qedexekirina PKK'ê jî li hundir û li derve zêdetir 20 kesên PKK'yî agir berî canê xwe dan û bi vê yekê dilsoziya xwe ya bo Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan nîşan da.

Agahiyên berfireh jî hêla Nûnerê PKK'ê Kani Yılmaz ve di 14'ê sermawezê de li Romayê bi civîneke çapemeniyê hatin ragihandin. Kani Yılmaz da zanîn ku Serokê Giştî yê PKK'ê Öcalan jî bo ku kêşeya kurd bixe rojeva cîhanê û ji vê kêşeyê re çareseriyê siyasî bê dîtî, gaveke bi vî rengî avêtiye. Yılmaz xwest ku di zûtirîn katê de statûya siyasî ya Öcalan bê diyarkirin. Kani Yılmaz da xuyakirin ku li hemberî gelê kurd bi hevkarîya Tirkiye, Amerîka û Îsrailê komployeke mezin hatiye li dar xistin. Her wiha Yılmaz da zanîn ku Serokwezîrê Rûsyayê Prîmakov û Serokwezîrê Yewnanîstanê Sîmîtis jî di nava vê lîstîkê de cih girtine.

Di heman rojê de Komîteya Navendî ya PKK'ê daxuyaniyek belav kir. Di daxuyaniyê de li ser wateya gava Öcalan



tê rawestandî û tê gotin ku çûna Öcalan xwediyê wateyê siyasî ye û tu car ne girêdayî arîşeyên ewlehiyê ye, lewre Öcalan dikare li Kurdistanê di nava ewlehiyê de xebata xwe bidomîne. Ji dewletên Ewrûpa û Îtalyayê tê gotin ku ev gav bo çareserkirina kêşeya kurd wekî hincet bê nîrxandin û ji tevgerên ku rû-

meta gelê kurd rencîde bike, xwe bidin alî. Di daxuyaniyê de bang li gelê kurd tê kirin, da ku ew ber bi Romayê biherke.

Her wiha Komîteya Navendî ya PKK'ê li bang hêzên neteweyî yên kurd jî dîke û dide zanîn ku hatina Öcalan bo Romayê hinek berpîrsiyar li wan jî bawer

e qonaxeke nû:

nîqas dîke

Paytexta kurdan Roma

Li ser banga PKK'ê bi hezaran welatparêz û niştimanperwer hatin Romayê bi vê yekê jî paytexta Îtalyayê rengê bajarêkî kurdan girt. Lewre jî rojnameya "Ultime Notizie" du rûpelên xwe bi kurdî bi sernavê "Roma paytexta Kurda ye" weşand. Bi taybetî di 16'ê sermawezê de nêzî 40 hezar kurd meşek li dar xist. Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan jî bo xwepêşandanê peyamek şand.

Öcalan di peyama xwe de li ser sedema çûna xwe ya bo Romayê radiweste û dixwaze ku gelê kurd meşa xwe heta azadbûna Kurdistanê bidomîne. Öcalan gotinên xwe wiha didomîne: "Me hûn bi tenê nehiştin. Ji bo ku ez bi can, giyan û jiyana xwe ji vê meşê re bibim bersiv, ez hatime vê derê." Öcalan li ser wateya siyasî ya hatina xwe radiweste û jî dewletên ewrûpayê jî dixwaze ku ji bo çareseriyê kêşeya kurd ji hatina wî sûde wergerin û wateyê siyasî bidin vê tevgera wî. Öcalan bi bîr dixwe ku komara tirk bi van kirinên dîrû mirovaniyê nika re tişteki bi dest bixe û êdî kes nikare piştevaniya dewleteke, wiha dîrû pîvanên mirovahiyê, bike. Di peyama Öcalan de spasdarî bo helwesta erênî ya hikûmet û gelê îtalî tê pêşkêşkirin. Öcalan peyama xwe bi van gotinan diqedîne: "Dê komplokêr tîk biçin û gel bi ser bikeve." Êvara 16'ê mehê jî MED-TV li di nava gel de bernameyê yekser pêşkêş kir, ku tê de li ser girîngiya hatina Öcalan bo Romayê hate rawestandin. Her wiha televîzyona îtalî "Raiuno" bernameyek li ser kêşeya kurdî pêşkêş kir. Di vê bernameyê de kêşeya kurdî hate nîqaşkirin. Her wiha di vê bernameyê rojnamegerên tirk jî beşdarî kir, lê ji ber helwesta wan a neyînî cidî nehatin girtin, lewre jî wan bername protesto kir û jî stûdyoya ku jê beşdarî bernameyê dibûn, derketin.

Li ser çûna Öcalan a bo Romayê Konseya Leşkerî ya ARGK'ê jî daxuyaniyek belav kir. Di daxuyaniyê de gotin ku berxwedana gelê kurd ya li hemberî komploya komara tişt, gihîştîye asta berxwedaneke giştî. Her wiha tê gotin ku bi gava Öcalan tîkoşîna gelê kurd gihîştîye qonaxeke nû. Konseya Leşkerî ya ARGK'ê dide zanîn ku li hemberî vê raperîna gelê kurd û gava girîng a Öcalan derdorên xêrnexwaz jî ketine nava keftûlefta û pey hinek listikên nebixêr. Her wiha di daxuyaniyê de li hemberî van listikan hişyarî û pejkariya raya giştî tê xwestin.

Di daxuyaniyên tê diyarkirin ku tîkoşîna gelê kurd yek ji mafdarîna tîkoşîna gelan a li hemberî qirkirin û tevkuji-

LI MOSKOVAYÊ GOVENDA JI ÊGIR

Piştî belavbûna nûçeyên li ser Öcalan gelê kurd da zanîn ku ew dê li dor Öcalan helqeyeke ji êgir pêk bînin. Piştî vê nûçeyê digel çalakîyên wekî meş, xwepêşandan û grevên birçibûnê, çalakîyên xweşewitandinê jî digel qedexekirina berpîrsên PKK'ê zêde bûn.

Di 17'ê sermawezê de saet li dora 3.30'yan du mîlîtanên PKK'ê Ahmet Yıldırım (Taylan Umut- Çewlik-1960) û Remzi-Akkuş (Jêhat-1974-Diyadîn) xwe li ber Dûmaya Rûsyayê şewitandin. Di dema çalakîyê de wan sloganên mîna "Bijî Serok Apo" û "Bi can bi xwîn em bi te re ne ey Serok" qîrandin. Çalakîyan wan li Rûsya û cîhanê gelekî deng veda. Du mîlîtanên PKK'ê li pey xwe nameyêke bi kurdî hişt. Di nameyê de armanca çalakîyê vegotin û nasîna statûya siyasîya Öcalan tê xwestin.


yan e û digel hemû astengiya destkeftinên mezin bo gelê kurd bi xwe re tîne. Daxuyani dide zanîn ku ev 15 sal in artêşa gerîla ARGK'ê şer dîke û di vî şerî de jî heta ji wan hatiye, li gorî rêz û rêçikên navneteweyî yên şer tevgeriyane. Dîsa tê gotin ku ji kêmasî û çewtîyên ku heta roja îro hatine kirine, fermandariya ARGK'ê berpîrs e. Dîsa fermandarên ARGK'ê di vê daxuyaniyê de didin xuyakirin ku ew çalakîyên li derveyî pîvanên şer ên ku wan nekarî rê li ber bigirin, şermezar dikin û ew dê girêdayî rêpîvanên navneteweyî yên şer bimînin.

Di daxuyayîna ARGK'ê de rola Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan di şer de bi van gotinan tê şîrovekirin: "Serokê tîkoşîna me ya neteweyî Serok Apo, wekî hemû sazîyên neteweyî rênîşandariya tîkoşîna gerîla jî kiriye. Bi vî awayî jî peywira xwe ya serokatîyê anîye cih, ji bilî vê yekê jî destpêkê heta roja îro tu caran di nava xebatên şer ên pratîk de cih negirtiye. Di nava şer de ji bo li gorî rêz û rêçikên navneteweyî yên şer bê tevgerîn, rista xwe ya serwestkirin û rexnekirinê anîye cih û serastkirina çewtîyan xwestiye. Xencî vê yekê jî bo çareseriyê sê caran agirbest îlan kiriye, ji bo çareseriyê bang li komara tirk kiriye. Heke ew bang negihîştibin encameke erênî, berpîrsê vê yekê komara tirk e." Di daxuyaniyê de tê ragihandin ku gerîla her wekî berê, dê ji niha û bi şûn de jî li ser xeta siyasî û bîrdozî ya Öcalan bimeşe. Di dawîya daxuyaniyê de tê gotin ku gava Öcalan ji bo aştiyê gelekî girîng e û heke bersiveke erênî bê dayin,

dê di serî gelê tirk hemû mirovahî sudewar be. Lê heke dewleta tirk dev ji komployan bernede, dê gerîla heta dawiyê şer bike. Piştî van gotinan tê xwestin ku her kes li ser vê esasê tevbigere. Her wekî di serî de jî Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan dabû zanîn, gava ku wî avêt di warê navte- weyîbûna kêşeya kurd de qonaxeke nû da destpêkirin. Ji roja ku Öcalan ji balafirê peya bûye heta îro, kêşeya kurd di rojeva hemû cîhanê de ye. Kesê li nik jî, yên li dijî xwe mecbûrî nîqaşkirinê dibînin. Li seranserî cîhanê kurd li ser piyan in û ew yek bala cîhanê dikişîne ser kêşeya kurd.

Bi vê yekê re helwesta dewleta tirk tûjtir dibe, lewre jî dest avêtiye çeka zengarî: şovenîzmê. Bi taybetî çalakîyên gelê kurd ên li Kurdistan û Tirkîyeyê dewletê dîn û har dîke. Lewre jî divê gelê kurd li hemberî her cure êrîşan hişyar be û heta ji wan tê raya giştî ya Tirkîyeyê jî di vî warî de agahdar bike. Lewre rayedarên tirk heta hetayê nikarin li hemberî vê pêla aşî û azadiyê li ber xwe bidin. Heke gelê kurd di warê agahdarkirina gelê tirk de jî tiştê ku dikeve ser xwe pêk bîne, dê li hundir jî rê li ber nîqaşên çareseriyê vebe. Ji niha ve hinek qala kêşeya kurd dikin û avêtina hin gavan dixwazin. Gelê kurd di daxwazên xwe de mafdar e û lewre jî tu êrîşên şovenîst nikarin rê li ber geşedana doza gelê kurd bigirin.

NAVENDA NÛÇEYAN



dîke, lewre dewleta tirk vê jinavêbirina Öcalan dixwaze gelê kurd ji holê rake. Dîsa bo raya giştî ya cîhanê armanca dewleta tirk a ji bo qirkirina gelê kurd tê xwestin û tê xwestin ku ji bo parastina hebûna gelê kurd hemû kesên aşîxwaz û azadîxwaz xwedî li Öcalan derkevin.

Romanivîsê perava jiyane:

DOSTOYEVSKI

Fiyodor Mihayloviç Dostoyevski, di sala 1865' an de dest bi nivîsîna Romana "Tawan û Seza" kir. Wê demê Dostoyevski mîna qehremanê vê pirtûkê "Raskalnikov" heta qirikê di nava deynan de mabû. Di jiyana xwe de ji layê aborî ve di rewşa herî xerab de bû. Di heman demê de jina Dostoyevski ya ewil mir û di pey mirina jina wî re birayê wî yê mezin Mikhaîl jî mir. Mirina birayê wî Mikhaîl ew xist binê barekî diwar û giran. Lewre Dostoyevski neçar dimîne ku berpirsiyariya jin û zarokên birayê xwe bigire ser xwe. Xerabî li ser bejna wî bûbû kirasekî bêyom.

Weşanxaneya Dostoyevski dema dest ji karê çapkirinê kişand, sî hezar rûble deynê Dostoyevski çêbû. Bêhêvhiitiyê bela xwe jê nediqerand û xedartirîn birîna jiyane, birîna darengî, roj bi roj xwe berdida nava giyana wî. Dostoyevski neçar ma û bi weşangerê

Dostoyevski ji aliyê rexnekarên cihanê yek ji baştirîn romanivîsên cihanê tê binavkirin. Çi jiyana wî û çî jî navero-ka romanên wî bi têra xwe balkêş in. Lewre Dostoyevski tevna romanên xwe li ser rastiya jiyana xwe dirêse. Romanên wî bi taybefî di warê şayesên psîkolojîk de serkeftirîn roman tê hesabandin û ew jî wekî psîkolog tê ragihandin.

otelê. Ango jiyana wî pir ji ya lehengê romana wî "Tawan û Seza" ne cudatir bû. Her du jî bûbûn hevrê û hevparên rêç û çarenûsekê. Digel ewqas piçûkdîtin û jiyaneke perîşan Dostoyevski dest bi pirtûka xwe "Tawan û Seza" kir.

Poşmanî ji ber tirsê ye


Dostoyevski di vê hengê de vejeriya Rûsyayê. Li Rûsyayê jî rewşa wî ya aborî wekî berê bû. Mafê çapkirina romana "Tawan û Seza" firot Kathovê xwe-diye rojname mehane "Nûçegihanê Rûsyayê". Lê diravê ji çapa pirtûkê dihatin bi dest xistin, têrî pêdivî û deynê wî nedikirin. Dostoyevski digel ku bi nexweşîna "Sara" ketibû û bijîşk jê re gotibû nenivîsîne û xwe newestîne jî, dest ji nivîsîn û xwendinê berneda, zêdetir xwe li xwendinê û nivîsandinê şidand. Dostoyevski êdî tê derdixist ku dilqê dilreşiyê û bêyomiyê li dilqekî kenok û firîşteyî werdigeriya.

Ango şens bi şûnde dizivirî. Di demên ewil de tirsê dabû ser hemû tirsên wî. Gelo kesên ku ew

ku wî girtibû keçeke hivdeh salî bû. Navê wê Anna Snitkina bû. Dostoyevski di meha reşemîya sala 1867' an de bi wê re zewicî. Di van her sê heyvan de di 29'ê kewçêrê de romana Qumarbaz qedand û dîsa li romana Tawan û Seza vejeriya.

Romanivîsê navdar Dostoyevski di 1821'ê de li Moskovayê ji dayika bû. Wê demê bavê wî li nexweşxaneya Maryinski, ku ew lê hatibû dinê, doktor bû. Dema wexta wî ya xwendinê hat bavê wî, ew û birayê wî şandin Petersburgê dibistana leşkerî beşa muhendîsiyê. Dostoyevski di sala 1841'ê de, di 20 saliya xwe de di artêşê de bû serbaz lê di sala 1844' an de jî malnişin(emekli) bû.

Dostoyevski di kurteçiroka xwe ya bi sernavê "Hestiyarî û Evînî" de wiha dinivîse



alozi de, hemû tiştên ji çavan dût bibîne û li gor hişmendîya xwe wan şîrove bike. Lewma di sala 1865' an de ji Wiesbadenê vejeriya Petersburgê û bi heyecan dest bi romana "Tawan û Seza" kir. Pêşî bira ewil ya romanê qedand û paşê romana xwe ya bi navê "Serxoşin" jî beşdarî nava romana "Tawan û Seza" kir. Bi vê yekê hem ji hêla mijarê û hem ji hêla vegotin û naverokê ve ev roman dewlemendtir kir. Paşê roman bi xwe kir du beş. Çi heye ku Dostoyevski berî kesayetiya lehengê romanê Raskalnikov û şeweya jiyana wî di mêjiyê xwe de nîgar bike, bandoreke erênî û berbiçav ji çiroka Puşkin a bi navê "Keçika Mançe" werdigerê. Lewre Dostoyevski di nameyê ku bo hevalekî nivîsiye de wiha dibêje: "Keçika Mançe" ya Puşkin, ez nizanîm çend car e ku dixwînim. Puşkin di çiroka xwe de bi analiz û dahûrandîneke têkûz hemû hêlên giyan û derûniya qehremanê çîrokê "Herman", hemû êş û hêviyên wî, li ber çavan radixe. Heman rewş di roman "Tawan û Seza" ya Dostoyevski de jî tê ditîn. Ango Raskalnikov û Herman du parçeyên sêvekê ne. Raskalnikov û Herman herdu jî xwe dişibînin Napolion, an jî wiha difikirin. Ji bo diravan her yek pîreke dewlemend dikujin û paşê herdu jî têk diçin."

Romanên sansûrbûyî

Dostoyevski dema romana Tawan û Seza qedand, ji bo çapê jî xwedanê rojnameya "Nûçegihanê Rûsyayê" re şand. Lê ew ji weşanger dixwaze ku bi tu awayî dest bi peyvسازی û naveroka wê nede. Bes di sala 1866' an de dema ji havîngeha xwişka xwe vedigerê Petersburgê, dibîne ku du birên romanê jî bo guhertinê li wî hatine vejerandin. Dihate îdiakirin ku di van birên romanê de şopên nihîlîzmê(hiçparêz) hene û ev şop jî wê demê li Rûsyayê li derveyî exlaq dihatin ditîn. Dostoyevski xemgîn bû û jî neçarî jî nû ve dest bi nivîsandina birên romanê kir. Ew bir jî nû ve nivîsîn û li weşanxaneyê vejerandin. Dostoyevski baş pê dizanibû ku yê bi ceribandinan sansûrê pêk tînin, çiqas bêwijdan in. Lewre hê ne dût, du sal berê dema romana xwe ya felsefî, "Notên ji Binê Erdê" jî çapê re amade kiribû, jî ber nîrê sansûrê ketibû rewşeke ji reng û rastiya xwe durtketî. Ji ber van egeran dengê Dostoyevski, yê li ser serê sazûmanê pêl dabû, daketibû radeyê nîzîm. Edî tenê dikir pite pit. Lê bes dîsa jî li dijî sazûmana mafenas, zîlamêkî ku çeka xwe her dem di dest xwe de digirt û bi kar dianî bû. Lawê dijwariyê Dostoyevski di heyva reşemîya sala 1881'ê de çû ser dilovaniya xwe. Berhemên Dostoyevski li pey xwe hiştin çend heb jê evin. "Gêjik, Yên Bîndest, Qumarbaz, Hin Însanok, Tawan û Seza, Birayên Karamazov..."

AMEDEKAR: H. BAQÎ KOVAN

keysperest Stelovski re peymanek girêda. Li gorî mercên vê peymanê divê Dostoyevski hem mafê hemû berhemên xwe yê çapbûyî bida Stelovski û hem jî divê di 1'ê Sermaweza 1866' an de romaneke nû binivîsandin û jî çapê re amade bikira. Di encama vê peymanê bi Stelovski re hinek dirav bi destê wî ketin. Çû Wiesbadê çî diravên pê re hebûn, wîndî kir. Paşê jî Turgenyev hin dirav bi deyn xwestin, Turgenyev pêncî taler dayê. Dostoyevski di demeke kurt de ew jî wîndî kirin. Dostoyevski li Wiesbaden, di odeyê xerabe ya otelekê de bi cih bû. Xwediyê otelê kirê jê nedistand. Çi heye ku Dostoyevski bûbû mijara wext û dembuhêrê rêvebir û karsazê

deyndarê wan e, dê wî nekin rêwiye gir-tigehê? Lê berevajî vê yekê xwişka wî deriyê havîngeha xwe, ku li nêzî Moskovayê ye jî wî re vekir. Dostoyevski li vê havîngehê bi cih bû û demeke xweş li vê havîngehê buhurand.

Dostoyevski di heyva rezberê de vejeriya Petersburgê. Edî jî bo nivîsîna romana Stelovski tenê sê meh mabûn. Heke Dostoyevski ev roman nenivîsandin, diviyabû dev ji mafê hemû berhemên xwe yê çapbûyî biqerîya. Ji ber vê egerê nivîsîna romana "Tawan û Seza" jî bo kurtedemekê rawestand. Stenografek (leznivîs) peyda kir û bi wê dest bi nivîsîna romana "Qumarbaz" kir. Stenografa

:"Nêzîkbûna seza dike di hest û ramana mirov de poşmaniyê peyda dibe. Carna di dilê herî dijwar û hişk de jî ev wisa ye. Tiştê ku poşmaniyê pêk tîne, tirs bi xwe ye." Dostoyevski jî ber van romanên xwe, ji layê îktîdarê ve wekî nivîskarekî alozi û anarşiyê pêk tîne, tê nîşandayin. Lewre der barê wî de doz tê vekirin. Encama doza wî gelekî lê giran û dijwar tê. Ji ber ku bi vê dozê çar sal cezayê karê giran li Sibîryayê li wî tê birîn.

Di vê heyama dilîtiya wî de romana "Tawan û Seza" her dem nakokîyê mezîni di mêjiyê wî de diafirîne. Li ser van her du bêjeyan kete lêgerînan. Armanca wî ew bû ku di binê vê derya mişt

Navenda Çanda Mezopotamyayê ya İzmirê

● 21.11.98 şemî:

Konsera Koma Amed 'Dergûş', saet:18.00

● 2.11.98 yekşem:


konsera Koma Amed 'Dergûş' seansa yekem:15.00- seansa duyem:18.00

● 23.11.98 duşem: Bi Koma Amed re gotûbêj, saet:18.00

● 21.11.98 şemî:

Li HADEP'a Bağçolarê Konsera Koma Gulên Xerzan, saet:15.00

ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



Navenda Çanda Tohum

● 22.11.98 yekşem: 'Şabaş ji wan kesan re ku di bablîsokan de li ser devê kêrê dimeşin'.

Navenda Çanda Tohum-Özgür Gelecek-Malbatên Şehîdan-Nîşandana Diayê-Helbest-Ozan Mustafa (NÇM), Güneşe Türkü, saet:14.00 YÇKM

● 21.11.98 şemî: Filmê 'Li cem min bimîne', saet:16.00

● 22.11.98 yekşem: Bi zimanê huner mirov û civak-4 'Di hunera wêne de Epik', saet:14.00

Hunermend jî li Romayê ne

"Em li vir di nav gelê xwe de ne. Dema rewşa gel kete xetereyê pêwîst e berî her kesî hunermend helwesta xwe diyar bike."

TÎŞK

Nivîskarê me ji ber rewşa ne-asayî nekarî nivîsa xwe bişîne.



BEKIR ŞIVANÎ

Hunera mezin di nav gel de bi pêş dikeve

Çûyîna hunermendên kurd a Romayê tişteki baş nişanî me da; Hunera mezin di nav gel de bi pêş dikeve. Ji bo vê jî, em hinekî li diroka hunerê binêrin. Her neteweyek, her gelek li gori rewşa xwe pîvanan jî xwe re bingeh digire. Sedsal, heta hezar sal jî derbas bibe ev gel dev ji van pîvanan bernade û xwe wisa bi pêş ve dibe. Her çiqas carinan di van pîvanan de hin guhartin çêbibin jî, lê belê giyana xwe ji van pîvanên berê distîne...

Tiştên me gotin, di warê çand, huner, wêje û ramanê de jî rast in. Ji ber ku çand, huner, wêje û raman bi rewşa gel û pîvanên gel ve wekî neynûk û goşt girêdayî ye. Û ne mimkûn e ku mirov wan ji hev cuda bike.

Hunera herî bedew pîrsgirêkên gel tîne zimên...

Wêje ya herî bihêz, ji nava gel derdikeve...

Raman, eger xwe bi gel dabe peji-randin, heta hezar salan jî, neyê jibir-kirin...

Çand, bi gel re bi pêş dikeve. Eger gel paşketî be, çand jî, wê demê paşketî dimîne.

Di roka hunerê, wekî diroka mirovatîyê kevn e. Mirovatî dema ji tarîtiyê derket, pêwîstî bi temînkirina hin tiştan dît. Di destpêkê de xwe ji bûyerên xwezayî parastin, xwarin û vexwarin bû. Lê belê mirovatî bi pêş ket, di van pêşketinan da pêwîstî jî, zêde bûn...

Mirov, asîman, derya û dûrbûn merq kir. Vê meroqê pêşketinek jî bi xwe ra anî... Lê di van pêşketinan de kêmasîyek girîng hebû. Ev jî, pîrsgirêkên ragihandinê bûn. Mirov zor da xwe û ji vê pîrsgirêkê re çareya çêkirina wêneyan dît. Ev çare di diroka hunerê de jî, bû pêngavek...

PERWER BENGÎ

■ **Ozan Xelîl Xemgîn:** Em li vir di nav gelê xwe de ne. Ji aliyekî din ve dema rewşa gel kete xetereyê pêwîst e berî her kesî hunermend helwesta xwe diyar bike. Hunermendê bi navê gel bikeve tevgerê, pêwîst e di rojêke wisa de derkeve holê. Em niha bi gelê xwe re ketine greva birçibûnê jî. Wekî gelê xwe em jî heta dawiyê bi Serokê Neteweyî re ne. Huner û hunermendiya rast, Öcalan hînî me kir. Di rojên wisa de

hunermendê rast diyar dibe. Wekî gelê me yê li vir moral û coşa me jî, bilind e. Em li vir ji bo gelê xwe çand û hunera kurdî pêşkêş dikin.


■ **Ozan Diyar:** Wekî gelê xwe pêwîst e hunermend jî piştgiriya Serokê Neteweyî bikin. Ji bo vê yekê em hatin Romayê. Em hunermendên gelê ku têkoşîna rizgariyê neteweyî dide ne. Pêwîst e em hemû hunermend, li dora



Hunermendên ku niha li Romayê di nav gel de hunera xwe pêşkêş dikin, ev in; Hozan Diyar, Hozan Şemdin, Hozan Xelîl Xemgîn, Hozan Cewad, Hozan Xemgîn Bîrhat, Hozan Peywan, Merdan, Şiyar Munzur, Merziye Reza-zî, Hozan Aydın, İsmail Mamîlî, Celîl Asidî, Hozan Kawa, Hozan Zendîn, Koma Sefkan, Koma Mizgîn, Koma Berfîna Besta, ji Koma Amed Serhat, Memo û Suleyman û şanogerên Koma Ehmedê Xanî.

Me dîtînen hunermendên ku niha li Romayê ne stand.

'Öcalan hunermendî hînî me kir'



Li Romayê wekî bi hezar mirovên Kurdistanî, bi sedan hunermendên kurd jî beşdariyê di çalakiyê de dikin.

Serokê Neteweyî diwarekî çêbikin.

■ **Ozan Xemgîn Bîrhat:** Em ji bo gelê ku li vir amade ne ji sibê heta şevê merşên şoreşgerî, stranên ku serokatiya me tîne zimên û kilamên klasîk pêşkêş dikin. Em wekî hunermendên kurd, heta dawiyê bi serokatiya xw re ne.

Qesra Elo Dîno

Berê li Kurdistanê ji bilî zilm û zora Împaratoriya Osmaniyan, çewsandin û pîkoliyên mîr û axayan jî, li ser gelê kurd dihat meşandin. Axa bi mîrên herêmê ve girêdayî bûn. Lewre mîr û axayan çî bikira, çî bigota, tu kesî nikaribû dengê xwe derxe. Û wan mîr û axayan xerc, bêş û qaçor ji gel bi zorê distandin. Kesên ku nedidan ew bi îbret didan darizandin û didan kuştin. Ji bo vê yekê mîr û axa xwedî

axê. Axa hêrs dibe çend peyayên xwe bi çek dike û ji wan re dibêje: "Zû herin wî gundiye nankor bînin vir." Peyayên axê davêjin ser mala gundiye xwediyê kewan. Gundiye hejar digirin û bi darê zorê tînin hizûra axê. Silo axa tasek av ji xulamê xwe dixwaze û li gundiye hejar vedigere, dipirse: "Segbav, ma te çima kewê xwe ji min re neşand." Gundî bêdeng dimîne. Axa tasa avê vedixwe û tasa sifir dixwe nava êgir û

wan li erdê dirêj dike û dibêje wan: "Herin bibêjin kerê axayê xwe bila ew bê lingê min." Peyayên axê vedigerin tînin hizûrê. Axa hêrs dibe û xwe tîrş û mîrş dike. Nav di xwe dide: "Ez Silo yê Ferho, gundiye kî birçî û tazî serê xwe li ber min radike." Axa peya û xulamê xwe bi çek dike û dişîne ser gundê Elo Dîno. Lê hîn peyayên axa negihîştine gund, Elo Dîno pê dihesse, ji gund derdikeve, diçe. Peya û xulamên axê xanî û mala

gelek dafik û xefikan li pêşiya Elo datînin, ji bo ku wî bikujin. Lê, Elo hemûyan vala derdixe. Careke din mîr û axa gelek qasidan dişînin cem Elo û dibêjin: "Tiştê ku te kiriye bira ji te re be, were em ê li hev werin." Elo baweriya xwe bi mîr û axayan nayîne, ji bo ku wan baş dinase naçe. Elo çend salan wiha derbas dike û bi vê mîrxasiya xwe nav û dengê mîr û axa dihejîne.

Demek derbas dibe, rojekê Elo bi karekî re tê dora gundê Cizîra Botan, mîr pê dihesse, peyayê xwe bi çek dike, li ser gund digere. Elo bi dest dixin, dîl digirin û wî tînin hizûra mîr. Gelê herêmê bi giritna Elo pir xemgîn dibe. Ji bo ku di dema Elo de, zilm û zora mîr û axayan kêm bûbû. Mîr, Elo qet nedîtibû û dizanî mîrxasekî çawa ye. Mîr li Elo dinêre, difikire û dibêje: "Elo bibe peyayê min, mîrtiya min bipejirîne, ez ê te efû bikim." Elo dengê xwe nake, serê xwe dihejîne. Mîr dibêje xulamê xwe: "Serê her du milên wî bikolin û du findan (mum) bînin bixin ser milên wî." Berî ku dest bi kolandina milê Elo bikin, mîr careke din jê dipirse: "Bersiva te ya dawî çî ye?" Elo serê xwe radike û bi awireke tûj bersivê dide mîr: "Zilm û zora we tu mirovên birûmet divê nepejirînin. Hetanî hûn nemirin û hukmê we xelas nebe, xweşî nayê herêmê." Mîr emir dide û milê Elo dikolin. Finda dixin milê wî û agirê finda pê dixin.

Finda di ser milên birîndar de dihelin, hetanî dawî ku, damarê milê Elo tînin şewitandin. Jan diavêje dil û hinavê Elo. Lê, Elo qet dengê xwe dernaxe. Piştî ku demek derbas dibe, mîr dîsa tê cem Elo û li rewşa wî temaşe dike. Rewşa Elo pir xerab û xedar e. Ji ber ku mîr pîkoliyên Osmaniyan bi Elo didan kirin. Mîr bi weçek bi xof ji Elo dîsa dipirse. Elo çî ji vê rewşê ne xweştir e?" Elo bi kotek û zorê serê xwe radike û bersivê dide mîr: "Ew rewş nexweş e ku mirov bi serfirazî nikaribe bijî, an jî bi serfirazî nikaribe mêvanê xwe bi rê bike, mîr li jinê, jin li mîr binêre." Mîr bi gotinên Elo diheje û dibêje: "Elo.. Weleh tu ne yê mirinê bûy... lê, ev hikmê mîran e." Elo vedikin, lê Elo hew dikare li ber xwe bide û bi mîrxasî diçe ser dilovaniya xwe. Mîr bi mirina Elo poşman dibe, lê êdî fêde nake. Elo bi mirina xwe, dikeve dilê hemû xizan û gundiyan hejar ku di bin zilm û zora axa û mîran de ne.

SEYDAYÊ BOTAN



pergala dadî û zagonên Kurdistanê bûn.

Li hemberî zilm û zora mîr û axayan, gelek kesên mîrxas serî hildan. Bi tevayî li serê çiyayan, hemû bi bêbextî hatin kuştin. Yek ji wan jî, li herêma Botan bi navê Elo Dîno bû. Elo mirovekî xizan û mîrxas bû. Ji bo ku serê xwe li ber zilma mîr û axayan radikar, navê wî li tevahiya herêmê deng dabû. Elo, ji eşîra Harûnan bû. Ji bo ku Elo xerc, bêş û qaçor nedidan û nedîçû hizûra axê û li ber wî serê xwe neditewand, navê wî bibû Elo Dîno!

Gundê Elo Dîno di destê axayê bi navê Siloyê Ferho de bû. Tesîra zilm û zora wî axayî, li ser hemû gundên herêmê hebû. Rojekê, Silo axa ji gundiye kî re ji bo kewan qasidê xwe dişîne. Lê, gundî kewê xwe nadê û qasidê Silo axa destvala vedigerin ba

sor dike. Wê tasa sor datîne ser serê gundî. Serê gundî dişewite, lê heta ku gundî namire ew axayê zalim tasa sor ji ser serê gundî ranake. Axa bi vî hawî gelek kuştinên bi îbret pêk tîne. Bê guman axê ev metodên pîkoliyê, ji Osmaniyan fêr bibûn. Axa li çiya ev hovîti û çavsofî pêk dianîn. Lê mîrî li ser axa, ji pîkoliyên axa bi îbretir didan kirin. Kesê ku xerc neda an jî malê mîr bidiziya, mîr tiştên ecêb dianîn serî wî. Têkiliyên mîr û axa gelek xurt bûn. Karê kîjanî biketa ba yê din, wî bê kêmasî dianîn cih. Mîr û axa gelê herêmê yê xizan ji xwe re belaş dida xebitandin, dikir xulam û kole.

Rojekê Silo axa peyayên xwe dişîne pey Elo Dîno, dibêje: "Axa gotiye bila were hizûra min." Elo dîno bi kevir û kuçan bi peyayê axê dikeve û wan perîşan dike, hetanî

Elo Dîno dişewitînin, vedigerin. Elo Dîno ji xwe re tivingekê dikire û tê ber ava çemê Dicle, li ser zinarekî rûdine, hinekî difikire û ji xwe re dibêje: "Ezê ji xwe re qesrekê li serê zînêr çêbikim."

Demek diçe, Elo dest bi çekirina qesrê dike, dinêre ku kelevanê mîr di ser çem re derbas dibin. Elo radihêje tivinga xwe, diçe pêşiya kelevanên ku di çem re derbas dibin û ji wan xerc û cirmê distîne. Nav û dengê Elo belav dibe. Mîr û axa gelek peyayên xwe yên bi çek dişînin ser qesra Elo Dîno. Lê, Elo Dîno bi serê xwe hemûyan bi paş ve vedigerîne. Elo dîno, bi perê xerc û cirmê zincîreke dirêj dikire, diavêje her du rexên avê, ji bo ku kelek, li zincîrê bi sekinin û xercê ji wan bistîne. Peryên ku zêde dimînin Elo dide gundiyan xizan û birçî. Mîr û axa

Ji Weşanxaneyeya Dozê du pirtûkên cihêreng


W eşanxaneyeya Dozê ji berhemên ku diweşîne zêdetir, bi mijarên pirtûkan balê dikeşîne ser xwe. Di warê weşandina pirtûkên kurdî de weşanxaneyên kurdî hinekî di nava dudilîyê de ne, lewre bazara zimanê kurdî wekî bazareke kesad tê dîtîn. Lewre jî weşanxaneyên kurdan ji bo ku pirtûkekê bi kurdî biweşînin, divê çend pirtûkên tirkî jî biweşînin. Pirtûkek jî bo ku hêjayî weşandinê bê dîtîn, divê ji hêla kesekî navdar ve bê nivîsandin an jî li ser mijareke popûler be. Weşanxaneyeya ku herî zêde li ser vî polîtîkayê hişk e. Weşanxaneyeya Dozê ye. Pirtûkên ku ji bo weşandinê guncan tînin, li ser mijarên sivik in, hinek pirtûk jî ji kurdan zêdetir xitabî biyanan dikin.

Xuya ye ku mercên heya weşanxaneyên kurdan bi vî alî de def didin. Lê ew jî ji bo guhartina van mercan zêde xwe naêşînin. Lewre li gorî dîtina wan, kurd bi zimanê xwe naxwînin, heke bixwînin jî bi tenê dikarin tiştên sivik bixwînin. Du pirtûkên ku mirov dikare wekî nimûne nîşan bide ji nav Weşanên Dozê derketin.

Stranên Kurdî

Pirtûka yekemîn berhevoka stranên kurdî ye. Di vî pirtûkê de, gelek

stranên ku di nava gel de belavbûyî ne, cih digirin. Mirovên ku dixwazin gotinên stranên kurdî hîn bibin, dikarin ji vî pirtûkê sûde wergerin. Lê divê bê gotin ku piraniya stranên ku di nava pirtûkê de cih girtine, stranên gelêrî ne. Amadekarê pirtûkê bi taybetî zêde cih nedaye marşên şoreşgerî yên piştî geşbûna Tevgera Azadiyê. Bo nimûne mirov nikare di nava pirtûkê de stranekê li ser gerila bibîne. Lê



tê zanîn ku heta niha bi sedan stran li ser gerila hatine afirandin. Ew jî terciha polîtîk a amadekar û weşanxaneyê nîşan dide. Zimanê pirtûkê bi awayekî giştî baş e, lê ev yek bi tenê ji bo stranên bi kurmancî rast e, ji bo stranên bi soranî û kirdkî mirov nikare heman tiştî bibêje. Lewre tê fêmkirin ku amadekar bi van zaravayên kurdî nizane, lewre jî gotinên stranên bi van zaravayan rast nehatine nivîsandin. Mirovekî ku bi van zaravayan dizane ji gotinên wan stranan tiştêkî fêr nake.

Kurdish guide with dictionary/ Sözlüklü Kürtçe Konuşma Kılavuzu

Berhema duyemîn di rastiya xwe de du pirtûkên ji hev cuda ne, lê ji ber ku naveroka wan wekî hev e, em dê wekî berhemekê li ser rawestin. Ji wan pirtûkan yek



bo îngilîzan yek jî bo tirkan hatiye amadekirin. Her çiqas weşanxaneyê navêkî bi kurdî li wan nekiribe jî mirov dikare wekî "Rênişandêra axaftina bi kurdî ya bi ferhengok" wergerîne.

Di her du pirtûk jî, ji bo kesên biyanî yên ku dixwazin hîn zimanê kurdî (zaravayê kurmancî) bibin, hatiye amadekirin. Di pirtûkê de diyalogên li ser jiyana rojane hene. Ji bo kesên ku ji derve tînin, berhema bi îngilîzî de gelekî sûdewar be. Li aliyê din berhema bi tirkî jî dikare bi bîra tirkan bixwe ku zimanekî kurdan heye û heke ew dixwazin bi kurdan re têkiliyêke baş deymîn, divê bi zimanê wan bipeyivin.

Pêwîst e li ser zimanê van her du pirtûkan çend tişt bînin gotin. Her çiqas amadekar gotiye em dê bi zimanê gel diyalogan bidin jî, di pirtûkan de peyvên wekî demjimêr, hûrdem û dansal hatine bikaranîn. Di sa bandora devokî li ser diyalogan diyar e. Her wiha hinek çewtîyên berbiçav jî hene. Me divê ji pirtûka bi îngilîzî çend nimûneyan derpeş bikin.

How are you?

Tu çawanî? (Hûn çawan in an jî tu çawan î?)

Sorry to trouble you.

Ji bo ku min we zivêr kir biborin. (Ji bo ku min hûn zivêr kirin, biborin.)

Don't drive so fast.

Pir lez ne ajon. (Evqas bi lez neajon.)

Di sa di beşa rêzimanê de cînavkên kurdî wekî cînavkên kiryar û yên bireser hatine binavkirin. Ev yek jî çewt e, lewre di kurmancî de cînavkên xwerû û tewandî hene.

SERWÎSA ÇANDÊ

Garîbaldiyê nûjen: Serok

HASAN KAYA



E v çend rojên dawîn, di jiyana me de rojên herî zêde tijî mitale û heyecan in. Gelek hestên dijber, di nav kêliyan de bi me re çêbûn; kêf û xemgîni, dilsarî û dilgermî, hêvî û teredût û gelek hestên mîna van di nav çend kêliyan de, dihatin û diçûn. Bi ya min ev psîkolojî li gorî tebîeta insên normal bû. Çima? Di jiyana hemû kurdan de cara yekem bû ku ji bo serokê xwe ketibûn nav guman, meraq û mitaleyan.

Ya rastî ez bi xwe tu caran nikarim wan hîsên, dema ku me bûyera çuyina Serok a bo Îtalyayê bihîst, bînim zimên. Nav jî li wan hîsan nayê kirin. Wekî ku mirov xewnekê bibîne û di xewnê de ezîzê ber dilê mirov ji cihêkî zêde zêde dûr hatibe mala ku mirov lê ye, lê mirov nikaribe wî bibîne. Ez ne bawer im ku tu kurdan di temenê xwe de evqasî dûvedirêj û bi baldarî li televîzyonê temaşe kiribe. Hemû şaneyên laşê me mîna

sixan rabûn ser piyan. Mîna sofîyekî ku bikeve cezbê... Bi taybetî ez dibêjim "sofî"...

Ev rewş nîşana çi ye? Nîşana netewîbûnê ye. Yek xisleta netewîbûnê jî yekbûyina jiyana ruhî ye. Yanê, bi hev re xemgîn bûn û bi hev re dilşa bûn. Bi hebûna serokê neteweyî ev hesta neteweyî gihîştê radeyeke bilind. Kurdekî/e sorî, kurmanc, kird; Kurdekî/e karker, zengîn, xizan, oldar, ateîst, demokrat, muhafezekar, sosyalîst, êzîdî, elewî û sînî li hemberî heman bûyerê, xwar û jor heman tişt his kir, kêr zêde mîna hev ketin nav mitale û gumanan.

Berî vî çend mehan Înstîtuya Kurdî ya li Stenbolê bi navê "Xanîden Platona İki Demet Çiçek" pirtûkek çap kir. Di vî pirtûkê de, bala min kişandibû. Nivîskar H. Mem bi sembolan be jî serokatî dişibande Tajdînê ku lehengê destana Mem û Zînê ye. Di sa digot jî bo îtalyayîyan Garabaldî kî be ji bo kurdan jî Tajdîn ango "Serok" ew e.

Ji niha û pê de Kurd dê peyva serok û serek nîqaş bikin. Di navbera peyva serek û serok de çi cihêti heye. Cihêti ev e: Serok peyve berfireh û dorfireh e; bi gelemperî ye. Li welatekî yek serok dibe. Peyva serek, ne gelemperî û dorfireh e. Li welatekî dibe

ku bi sedan serek hebin. Mînak serekê partîyan, serekê sendîka, înstîtu, eşîret û hwd. Lê yên wekî Omer Muxtar, Gandî, Garîbaldî, Hz. Mûsa, Bîsmark, Ho Çî Mihn, Che Guvera, Castro, G. Washington ji gelê xwe re serok in. Serokê kurdan di nav van serokên jorin de bêtir dişibe Che Guvera. Ji ber ku ne tenê ji bo kurdan, ji bo hemû Rojhilata Navîn serê xwe diêşîne, fikr û ramanên giranbiha vedibêje.

Ez naxwazim meselê dorfireh şîrove bikim, lewre cih têr nake, lê tesbîtek heye, hewce dike ez binivîsim: Heta niha gelek heval û hogirên Serokatîyê, digot 'em dereng serokatîyê fêr dikin. Em nagihin leza fikirîna Serokatîyê. Lewre dema ku ew guherîneke mezin pêk tîne, em pêşî tînegihêjin. Piştî, piştî ku em dikevin nav meseleyê em hîn dibin. Çûna Ewropayê ev waqîa zelaltir kir. Tesbîta duyemîn jî ew e ku di mercên herî dijwar de jî, Serokatîyê bêçare û bêalternatîf namîne û ji gelê kurd re (ji hemû beşan re) qinyateke xurt e. Li ferhenga kurdan a siyasî, dîrok û neteweyîbûnê de hinek tîgîh bêne zêdekirin. Di pêvajoyê de ev tîgîh, dê di jiyana rojane de cihê xwe bigirin û zelaltir bibin...

Li qerwaş pîroz be aş

Dizên xelîçeyên mizgeftan ên dema nimêjan, totikvalayê bêkêr, kurên gêjan, binêrin pîra mêrxur anîne ser rûyê erdê çi gur, ji zûrezûra wan diqete ziravê cudaxwazan, guh bidin xweşawazan: Wûûûû!

Ev deng tê ji Girtîgeha Metrîsê, kî dikare pîroz neke wê kozik û meterîsê. Berî niha me digot, "felekê te çima li me wa kir, te PKK li serê me peyda kir." Îro govenda me li dar e, xapemeniya me li ser kar e, ji we re nûçeyekê berkaş dike, bûyeran berepaş dike. Kerem bikin guh bidêrin vê bûyerê, vê mêrgê, vê kera li vê çêrê.

Bînerên heja.

Ji nûnerê dewletê yê ji girtîgehan berpirs birêz Yaşar Öz çalakîyêkek watedar li dar xist. Nûner Öz ku welatparêziya xwe di bûyera Susurlukê de peyitandibû û bi wê sûxrekariya xwe ji bûbû nûnerê komara Susurluk, biborînin, (nebêjin em çi biborînin. êdî hûn bi kêfa xwe ne, çeteyan, kujeran, dizan, rêbiran di vê buhurê re biborînin, bes nehêlin ku kurdek ji di ber we re bibore. Heta nehêlin ku kurd bi kurdî bilorînin ji.) komara kurên Alî Osman. Öz, bi vê çalakîyan xwe ya mezin û bêmêzîn, beravêti. li ber avê ti, dîroka tirkan a wekî marê zer birqonek,

bi çekên ku serkaniya giştî diyarî emniyetê kiribû û ew di gelek kuştinên kiryar welatperewer de hatibûn bikaranîn, neqîşand. Nûner Öz da zanîn ku ew ji bi qasî serok Cengiz Ersever welatperewer û dewletperewer e.

Bersiva herî baş ji çalakîyên PKK'ê re Yaşar Öz da. Wî tevî hevalên xwe yê welatperewer avêt ser qawîşa girtiyên

xerîb û girtiyekî îtalî dîl girt. Wezîrê Girtîyan dîsa biborînin (li hemberî vê çalakîyê bilîlîn) nûnerê girtiyên welatperewer Yaşar Öz niha ji Girtîgeha Metrîsê bi awayekî yekser radigihîne.


- Êvarbaş Yaşar Öz ê berêz! ew çalakîya welatperewer ji ku hate bîra we?
- Wûûûû! Wûûûû!
- Yaşar Özê berêz dengê me tê te?

- Belî, kalikên me yên ku ji qalîkê gûzê serhiştir, serbiriştir in, ji Asya Navîn ketin rê, havîn diçe zivistan tê, hey gidî Osman Paşa hey, kurê te îro li ser piyan in, wekî rişk û spiyan in, kuliyên berfê di ser me de têt, di buhurekî de em mane asê (de werin vî kerî di vê bihurê de derbas bikin). hinek dibêjin em bimînin li hêviya helîna berfê, hinek dibêjin em bikevin nava postê berxê. Ji wir dengê hat, dengêkî xweş: Wûûû! Em rizgar kirin ji vê rewşê, tazi û birsî me xwe gihand hewşê, me talan kir mala xelkê...

- Beraz Öz were ser kakilê gûzê, qalîkê pîvazê, li dora mijarê neçêre, wextê me beredayî nehêre. Karê we kiriyê karekî baş e, kêfa me dike xweş e. Hinekî şîrove bike vê bûyera faş e.

- Dema me dît rewşa kambax, welatîdîkin kerî bi kerî qax bi qax, me avêt ser qawîşa li rax, me îtalyanek bi dest xist bi sax.

- Pîroz be ew çalakîya faş, xwedê de negerîne kaş bi kaş, li pişt te ye hikûmet û artêş, aş ê te ye, li gorî dilê xwe lêke genim, kekê qerwaş.- Sipas û hezar sipas min xwîna cudaxwazan divê tas bi tas.



BI XELAT...

XAÇEPIRSA BI XELAT (147)

XAÇEPIRSA

Wêne	E	betan	S	P	E	A	B
ERD	A	L	A	K	S	U	H
Pirtûka nûçeyê	E	A	R	R	N	E	
ÎN	L	S	E	D	E	M	
Derfêkê nîşanê	I	E	S	X	V	A	
LA	H	E	Ş	I	N	V	N
Maweyekê	S	E	V	W	A	R	
J	A	J	A	L			
B	I	R	A	N	I	N	
J	A	N	R	N	E		

PEYVA VEŞARÎ

Bersiva Xaçepirsa 145'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihêjin destê me, em dê wan binirxînin û bi rîya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 147'an Pirtûka 'Stranên Kurdî' ye

Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Berpisekî ERNK'ê (wêne)	Deçekek	Bûyerên ne siyasî	Tipeke kurdi	Kardar	Tipa li dûv qyê
Paşeroj	Dawet. dilan	Bingeh. him	Navekî mêran	Bikêf	
Nekevî	1	Zanyar		Bajar	
cinavkeke pirsê		Tipa pêşin		Ço	dijberê bir
Bi kirdkî erê		Derhênerê k japon			Sembola nazîyan
Navçeyekê sêrtê	5 Xanî			Pêşgirek
Marka cixarê		Dehgdarê n adin		Ezperestî	6
Kesê hazî riyê dike		Cephe. enî		Şimendifer	
Bi kirdkî agir					
Naveke jinan					
		Hezkirin. esq			

PEYVA VEŞARÎ

1 2 3 4 5 6

Nîşe: Bersiva hejmarê 145'an 'Amûdê' ye. Di bersivên ku ji xwendevanan ji me re hatin de, tu kesî peyva veşarî rast nedîtiye. Ji ber vê yekê em xelatê dihêlin careke din.

Serokê Îtalya Luigi Scalfaroy: Ameyina Öcalanî firsendo gird o

Serokê PKK Îtalya şiyayin ser, kiştê ra mesela kurd kerd mesela navneteweyî, kiştê ra gama wayirê dewletbiyayin çekerd, kiştê bînra jî cografyaya ke Kurdistan biyo letey, a cografya de letanê Kurdistanî biyaro pêser û leteykerdoxanê Kurdistanî ra hesap pers kiro.

Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalanî verdê çend heftan jew programê MED-TV de komployanê peyinan ser ro vinderti-bi û peynî de wina vatibi: "Ma Enqere ra vejyayina bîm wayirê partî, Rohhilatê Miyanî ameyina bîm wayirê artêş û mayê Rohhilatê Miyanî ra vejyayina jî bibim wayirê dewlet". Nê vatenanê serokê PKK Abdullah Öcalanî ser ra, jû meng nêravêrd raya wayirê dewletbiyayin de gama gird çebiyê. Na gam jî hetê Serokê PKK Abdullah Öcalanî ya çebiyê. Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalan, vengdayinê heveyê mebûsanê îtalya ser, şanê 12'ê na meng teyara ya paytexta Rûsya Moskowa ra şî paytexta Îtalya Roma.

Senî ke pey hesiya Serokê PKK şiyoy Roma û hokmatê Îtalya ra statûyo siyasi wasto, serdaranê dewleta tirk hema qiyamet qilaynê û şiyayinê Serokê PKK Öcalan ze ke hetê polîsanê îtalya ya girotyayo binçim û peyra jî çebiyayo girotxane da nîşan. Hemû serdaranê dewleta tirk, rojnaman û televîzyonanê tirk qîrina serkewtin çekard û ze ke rojê roşanî pîroz kirê, o roj pîroz kerd. La belê maben ra hewna jew roj nêravêrd ke qîrina serkewtin û kêfweşin ci fek û zincî ra ame.

Çimki Serokê PKK zey vaten û zanayina înan nêçebiyabi girotxane, hokmatê îtalya Serokê PKK jew nêweşxaneyê taybetî de zey meyman tepîştê. Ancî eynî roj hemû televîzyonanê tirk de na mesele ser ro programê taybetî virazyay û şiyayinê Serokê PKK Abdullah Öcalanî yê îtalya ser ro qisey kerdî. Nê programan de jî serdaranê dewleta tirk, rojnamegeran û siyasetzanayan madeyê qanûnanê Îtalya wendê û vatê gaganî dewleta îtalya Serokê PKK teslimê ma bikiro.

Bi rastî jî a şew hemû qiseykerdoxan rind zanayê ke, dewleta Îtalya Serokê

PKK Öcalanî nêdana Tirkiye. La belê ancî jî, înan madeyê qanûnanê îtalya wendê û xo pê xapênayê. Heta heveyan vatê: "Dewleta îtalya, dewleta demokratîk û hiqûqî ya Goreyê demokrasî û hiqûqî jî lazim o ke serokê PKK bidîyo Tirkiye." La belê senî ke rojê didin muştê sarê wezîrê edaletê Îtalya fikrê xo qandê nêdayinê Serokê PKK ardî zîwan, serdarê dewlet, rojnaman û televîzyonana piya serdarê partiyanê siyasiyan (partiyê ke meclîsa tirkîyan miyan de ca genê) û nûstoxê nê rojnaman a seat ra tepya bî harî. Yanê vînanî ke verdê çend deqan, yan jî çend seatan ardîbî zîwan ê xo vîra kerdî û nafin verê xo açarna îtalya, xeberê (lengê) ke qeçekî (domanî) xo fek nêgenê nînan girotî xo fek û serdaranê dewlet û şarê îtalya ra xeberî day. Ze ke ma cor de jî ard zîwan zey qeçekana.

Öcalan rojevê cihan vurna

Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalan îtalya şiyayin peyra hema hema hema welatan de mesela kurd ser amey qiseykerdin. Bi taybetî jî, Ewropa de. Çend rojî yo Ewropa de hemû qisey û vatenê mesela kurd ser ro vajiyenê. Xeylê televîzyon û rojnameyê Ewropayê weşananê xo de ca danê mesela kurd

û şiyayinê Serokê PKK Öcalan yê Roma. Bi rastî şar û dewletanê Ewropa miyan de destego ke şarê kurdo qe rojê jî xo vîra mekiro destegê şar û dewletê Îtalya bi.

No mabend de destegê roj-


Serokê PKK Îtalya şiyayin ser, xeylê kesê persa "çira?" Îtalya pers kenê. Bi rastî êkê nay, pers kenê, eke bewnê biyayanê peyinan û vatenê ke Serokê PKK Öcalanî Rohhilatê Miyanî ra vejyayin ser ardê zîwan, cewabanê persa xo vînenê.

Serokê PKK Îtalya şiyayin ser, kiştê ra mesela kurd kerd mesela navneteweyî, kiştê ra gama wayirê dewletbiyayin çekerd, kiştê bînra jî cografyaya ke Kurdistan biyo letey, a cografya de letanê Kurdistanî biyaro pêser û leteykerdoxanê Kurdistanî ra hesap pers kiro. Wa her kes nay rind bizano ke, Kurdistan senî cografyaya Ewropa de biyo letey oyo wîja jî jew bo.

Biyayanê peyinan ra teva yo wînanîno ayseno (vînyeno): jû mesele ke bî mesela navneteweyî, qe kes jî nêşeno verê çareserkerdina a mesele bigiro. Ewro ra tepya dewletê ke giştê ci, leteykerdinê Kurdistanî de estê, vejyê werte û xo zewtanê kurdan ra xelisnayin (reynayin) de gam çekirê (berzê). Lazim o ke kes vatenanê serokwezîrê

Îtalya Masimo D'Alema çosmeyê nê vînanî de bivîno. Çimki vatenê ke Serokwezîrî îtalya D'Alema der heqê Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalanî de ardî zîwan balkêş bî. D'Alema pêserameyinê çapemenî de wina vatibi: "Lazim o dewleta tirk mesela kurd zey dewleta İngîlîz û Îspanya raya demokrasî û siyasiya çareser kiro. Mesela kurd raya demokrasî û siyasiya çareserkerdin de karo ke bikewo mildê hokmatê Îtalya ser, hokmatê Îtalya yo ê karî biyaro ca. Serokmarê Îtalya Luigi Scalfaroy jî serokê PKK Öcalan, welatê ci ameyin ser vat: "Îtalya ameyinê Öcalanî haqanê şaran dayin de firsendê do gird o". Ancî serokomarê Awisturya û Serokê Jûwinê (yewinê) Ewropa Thomas Klestilî jî, hem jî, Serokomarê Tirkiye Süleyman Demirelî ver de nezdiyê vînanînanê D'Alema û Luigi Scalfaroy ardî zîwan. Nê vatenan ra oyo ayseno ke dewletê Ewropa yê niwa tepya dest berzê (çekirê) mesela kurd. Gama ke dewletanê Ewropa dest çekard jû mesele, rojê çareserkerdinê a mesele yeno nezdi. Coka Îtalya şiyayinê serokê PKK raya xelsiyayina (reyayina) şarê kurd heveya kerd kilm (kurt).

MEMED DREWŞ



naman û televîzyonanê Îtalya xo vîra mekim. Eke destegê înan mevînim û xo vîra bikim destegê înan ma keno kor. Çimki rojnamanê Îtalya ra ULTIME NOTIZIE'y qandê destegdayina şarê kurd di rîperê xo bi kurdî, jû rîpera xo jî bi tirkî weşina û rojnaman û televîzyonanê bînan jî zaf zaf bi zîwanê xo ya ca da vengê kurdan.

Wina biyayin ser jî mesela kurd, bî mesela navteyeyî. Hetanî nika dinya de mesela kurd hendayê nêamê zîwan. Îtalya şiyayinê Serokê PKK Öcalanî êkê hetanî nika vengê kurdan nêşnabi eşna. Der heqê kurd û Kurdistanî de bi wayirê zanayin. Kes şeno wina jî vajo Serokê PKK Abdullah Öcalan Îtalya şiyayin ser rojevê cihanî vurna. Qe jû mesel, Şerê Kendaw (körfez) peyra rojevê cihanî de hendayê ca nêgirot.

Serokê PKK çira şî Îtalya?

WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (Imtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKOYUN

■ Yönetim Yeri:
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308

Beyoğlu/İstanbul
TEL: (0 212)
251 79 37
FAX: 251 95 85

■ Gerinendeyê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN
■ Berpîrsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
■ Yayın Koordinasyon:
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

■ BELAVKIRIN
BIRYAY Dağıtım
■ NÜNERİTİYEN ME
(Temsilciliklerimiz)
■ Amed:
Tel: 0 (412) 223 34 83

■ Mersin
Tel: 0 (324) 233 83 96
■ İzmir
Tel: 0 (232) 425 37 02
München:

(Nünerê Giştî yê Ewrûpayê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815
■ Swisre:

İhsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07

■ Hollanda:
S. A. Fewzi
Tel-Fax: 31 10 48 555 43
■ Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsiç

Xwişka Erdal Aksu Arzu Aksu.

Çalakiya Erdal bo me ferman e

Erdal, heke wekî ku çapemeniya tirk nîşan da, terorîst bûya, wê şevê dikaribû di balafirê de wan 33 kesan bikuje. Lê wî li hemberî hemû tiştan jî bombe neteqand. Ji bo kuştinê jî êrîş lê hate kirin, lê belê wî tu kes neêşand.

Welatparêzê kurd Erdal Aksu, şeva 29'ê kewçerê ji bo protestokirina şerê qirêj ku li Kurdistanê tê meşandin balafirêke Komara Tirk a bi navê Ayvalik revand û paşê ji aliyê polîsan ve hate înfazkirin. Xwişka Erdal Aksu Arzu Aksu di daxuyaniya xwe de got ku, înfazkirina birayê wê bi tevayî ji bo weşartina armanca çalakiyê bû. Her wiha Arzu Aksu bal kişand ser durûtiya çapemeniya tirk û wiha got: "Ger ku birayê min zindî bihata girtin, wê armanca çalakiya xwe bigota. Ji ber vê tirsê Erdal hate înfazkirin. Paşê çapemeniya tirk, ji bo weşartina armanca çalakiyê malbate me ji xwe re kire hedef." Aksu, bang li rayedarên dewletê jî

Malbata me bi vê çalakiyê serfiraz e


Arzu Aksu da zanîn ku malbata wê bi çalakiya birayê wê şad û serfiraz e. Aksu bal kişand ser êrîşên çapemeniya tirk ku li dijî malbata wan tê meşandin û wiha got: "Ji aliyekî ve malbata me nebaş hate nîşandan, ji aliyê din ve jî Erdal wekî mêrkuj û terorîstekî hate nîşandan û hate xwestin ku raya giştî bê xapandin. Ji bo ku îdiaya xwe xurt bikin, wan kuştina sê mamosteyan ku di sala 1995'an de li Amedê qewimîbû jî xist stûyê birayê min. Lê têkiliya Erdal qet bi wê bûyerê re tunebû. Erdal, heke wekî ku çapemeniya tirk nîşan da, terorîst

Mêrsinê bûn. Bavê min di qezayeke trafikê de jiyana xwe ji dest da. Di bin zordariyeke mezin de em jiyân. Dayika min Sultan ji bo ku me bide xwendin di gazînoyan de firaqotî kir, lê belê tu carî ji şexsiyeta xwe dûr neket. Xwişka min a mezin Kader piştî ku zewicî û bû xwedî zarok dest bi dergevanîya apartmanan kir. Xwişka min a bi navê Şafak ji sala 1990'î pê ve wînda ye. Em tu agahiyên jê nastînin. Hîn di wê demê de me serî li Emniyeta Mêrsinê da. Lê polîsan serê xwe pê re neêşand. Piştî çalakiya Erdal ku em hatin binçavkirin, Midfîrê Emniyeta Mêrsinê got ku ew tu agahiyên ji Şafak nastînin û cihê wê nizanin. Lê piştî wê bi rojekê çapemeniyê îdia kir ku ew li Afyonê di mala nebaş de dixebite. Ger ku ew di wir de dixebite, çima Emniyet cihê wê nizane?" Arzu Aksu da zanîn ku birayê wê piştî bûyera Amedê ji ber komployan dev ji mamostetiye berdaye.

Arzu Aksu dibêje ku malbata wan ji destê sîstemê tengasiyêke mezin kişandîye lê wan qet ji rastiya xwe tiştek ji dest nexistiye. Aksu wiha dibêje: "Çapemeniyê ev tev li dijî armanca çalakiyê kirin amûrê komployê. Erdal qet ji bo kêşeyên malbatî netêkoşiya. Wî bi tevayî kêşeya neteweyî dida pêşiya xwe û ji bo wê tekoşîn dikir. Ew li şûna berjewendiyên şexsî ji bo azadiya neteweyî têkoşiya. Nûçeyên çapemeniya tirk li cihêkî tîn amadekirin û tu rastîya wan tune. Piştî çalakiyê ku em hatin binçavkirin, emniyetê ji me pirsî û got: 'Hûn çalakiya Erdal çawa dibînin?' Me jî got, çalakiya birayê me ji me re ferman e û hetanî em sax bin em ê pişgiriya wî bikin."

Raya giştî dizane kî bêexlaq e

Arzu Aksu got ku çapemeniyê gotinên diya wê berevajî kirine û îdia kirine ku diya wê der heqê Erdal de gotiye: "Me di nav xwe de dijmin hewandiye û xwezî min Erdal neanîbûya dinê." Aksu her wiha diyar kir ku nav û wêneyê xwişka wê a 17 salî D.A di rojnameyan de hatiye weşandin. Bi van weşanan




"Ger ku birayê min zindî bihata girtin wê armanca çalakiya xwe bigota. Lewre jî Erdal hate înfazkirin."

çapemeniyê xwişka wê a xwendekar kiriyê hedef. Ev rûdan tev li dijî exlaqê çapemeniyê ne. Aksu gotina xwe wiha domand: "Em ê îfadeyên xwe yê emniyetê derxin holê û mafê xwe biparêzin. Çapemeniya tirk bila pêşî exlaqê xwe biwezîne. Bila dev ji exlaqê malbata me berde. Raya giştî baş dizane ku jiyana kê bêehlaq û sosret e. Birayê me Erdal tim ji me re digot: 'Mîrin jî ji jiyaneke bêrûmet çêtir e.' Em jî wê daxwaza wî ji xwe re wekî ferman dibînin."

Sultan Aksu: Kurê min zane bû

Dayika Erdal Aksu Sultan Aksu jî dibêje ku ew qet tiştên hatine serê Erdal ji bir nake. Dayika dibixem Sultan Aksu dibêje ku ji ber dilê wê dişewite ew zêde nikare tiştekî bibêje û wiha berde-wam dike: "Em li komareke wehşetê dijîn. Kurê min mamoste bû, ne mêrkuj bû. Lê dewletê ew înfaz kir. Erdal mamostetî dikir û rojekê tenê ji min re libasîk jî nedistand. Wî bi pereyên xwe ji xwendekarên xwe re pêlav û cil dikirîn. Mirovekî wilo çawa dibe mêrkuj? Armanca çalakiya wî armanceke siyasî bû. Wî bi çalakiya xwe rûyê wê komarê yê rastî derxist holê."

HABİP ÇELİK /MÊRSİN



Diya Erdal Aksu, Sultan û xwişka wî Arzu Aksu

kir ku dest ji politikayên xwe yê qirêj berdin. Aksu got ku politikayên dewletê bi hezaran bombeyên zindî derdixê holê.

Em der barê çalakiyê û şexsiyeta Aksu de bi malbata wî re axivîn. Xwişka Erdal Aksu Arzu Aksu da zanîn ku, pêwîst e pêşî armanca çalakiyê ji aliyê hemû kesan ve baş bê zanîn. Aksu got ku malbata wî çalakiya Erdal ji xwe re wekî ferman dibîne û wiha berde-wam kir: "Çalakiya Erdal, berî her tiştî ji bo protestokirina şerê qirêj ku li hemberî gelê kurd û tirk tê meşandin e û bange-ke mezin e bo raya giştî ya cihanê. Erdal, bi çalakiya xwe nîşan daye ku her welatparêzê kurd dikare bi çalakiyên xwe li dijî politikayên qirêj bibe bersiv. Lê hate xwestin ku armanca wê çalakiya siyasî, bi provakasyona bê berevajîkirin."

bûya, wê şevê dikaribû di balafirê de wan 33 kesan bikuje. Lê wî li hemberî hemû tiştan jî bombey neteqand. Ji bo kuştinê jî êrîş lê hate kirin, lê belê wî tu kes neêşand. Vê yekê jî daye nîşan ku Erdal kesekî pir dilovan bû û çalakiya wî bi tevahî çalakiyêke siyasî bû. Jixwe kesên di balafirê de jî wiha got."

Çapemeniya tirk bêexlaq e

Xwişka Erdal Aksu Arzu Aksu got ku çapemeniya tirk a ku malbata wan ji raya giştî re nebaş daye nîşan li dijî sincê çapemeniyê tevdigere û ew wan weşanan şermezar dikan. Aksu wiha berde-wam kir: "Piştî çalakiya Erdal tenê ji bo ku armanca çalakiyê berevajî bikin, wan malbata me wekî malbateke nebaş nîşan da. Bi destê çapemeniya durû em ji raya giştî re hatin teşhîrkirin. Her wiha Aksu malbata xwe bi kurtayî da nasîn. Berî niha bi 17 salan em koçberî